Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1394 15-Tîrmeh-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Fatma Ehmed bi tayên pembo û hiriyê çanda Kurdewarî diparêze

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Jina bi navê Fatma Ehmed bi çêkirina karên destan ji tayên hirî û pembo, çand û hunera destan a Kurdewarî diparêze û derdora xwe dixemilîne, tevî hemû zehmetiyên ku derket pêşberî wê jî, pîşeya ku wê ji zarokatiya xwe ve mîras girtibû, bi hezkirin diparêze.**



Karên hunerên destên jinan bingeha parastina çand, nasname û hunera kurdewarî ye. Jin ji dema berê ve heya roja îro hîn bi hunerên xwe ve girêdayî ne û hunerên xwe di nava civakê de belav dikin. Her jinek xweşikbûnekê bi destê xwe diafirîne û her afrandinek xwedî xweşikbûneke xwe ya cûda ye.

Fatma Ehmed jî yek ji wan jinan e ku di çil saliya xwe de bi tiliyên xwe yên jêhatî, her tiştên mîna ji cil û berg bigire heya zincîrên mifteyê, şal û guldesteyên gul ku bi tayên pembû di navbera destên xwe de bi rengên geş û bi karanîna tûj û derziyên dirûnê wan vediguherîne berhemên hunerî yên cihêreng.

Wê diyar kir ku nayê bîra wê kî ev huner fêrî wê kiriye, ji ber ku ew bi temaşekirina kombûnên jinan û şîşên hirî yên ku di destên wan de direqisin mezin bûye û got: “Dayika min ji bo me çekên hirî çêdikir in. Di dema berê de kombûnên jinan qet bê hunerên destan û dirûnê hirî nebûn û ji ber wê ez bi hezkirina hirî û rengên wê mezin bûm ku êdî min dirûnê li dû dirûnê fêr bûm.”

Di dema xwe ya vala de, wê ji bo derbaskirina demên xwe bi dirûnê hirî didît û her ku roj derbas dibûn, wê dest bi çêkirina perçeyên hirî ji bo malbat û cîranan kir, bi şertên ku hirî ji hêla wan ve were peyda kirin, lê di wê demê de wê tu perçe nefirot û beşdarî tu pêşangehan nebû.

Wê di gotineke xwe de wiha anî ziman”Cîranê min min şîret kirin ku ez tiştên ku ez çêdikim bifroş im, ji ber vê yekê min biryar da ku beşdarî projeyên piçûk bibim û bi vî rengî min dest bi çêkirina berhemên xwe kir. Min dest bi firotina perçeyên ku ez amade dikim kir û ez serbilind im. Tiştên ku ez çêdikim ji hêla mêvan û mirovan ve baş hatin e pêşwazîkirin, ku ev yek min teşwîq kir ku ez bêtir fêr bibim. Hirîya ku li ser medyaya civakî belav dibe ne weke hirîya li Qamişlo an li Sûriyeyê peyda dibe, ku ev yek Fatima neçar dike ku tenê tiştên peyda bikar bîn e, ji ber vê yekê wê hîs dikir ku perçe dişibin tiştên ku wê di xeyalên xwe de parve dikir.




Bi bilindbûna buhayê hirî û kêmbûna rengên wê re, zehmetiyên ku ew di karê xwe de pê re rû bi rû dimîne zêde bûn e. Fatma da xuyakirin ku hin kes hene ku rengekî taybetî dixwazin, lê ew li sûkê peyda nab e, ji ber ku sûkên li vir tenê celebên bingehîn peyda dikin û dibe ku hin ji wan xilas bibin. wê di dema berê de tayê hirî bi kêmtirî nîvê buhayê wê yê niha dikirî, lê niha jê re hinekî zehmet e.

Her ku dem diçe jî ew pirojeyên xwe zêde û xweşiktir dike da ku bala her kesî bikişîne. Ew dixwaze her tiştî bi ked û daxwaza xwe çêbike.

Di her pirojeyeke karê destê wê de jiyana dema berê di nava civakê de vedigerîne. Jin bi ked û hunerên xwe yên dema berê navdar in, her jinek bi civak û kevneşopiyên xwe tê xuyakirin ku heya roja îro jiyana wê demê ji nû ve vedigerînin û diafirînin.

Fatma heya vê rojê jî terka huerên xwe nekir, ji ber dixwest ku keda hunerên destên jinan tu carî neyê windakirin.

## Bi kamîreya Lîloz Hisên



## FERHENGA BIWÊJAN

**Mêşmirî ye:**
- Bi heman wateyê.

**Mêşan ji ser xwe nafirîne:**
- Bi heman wateyê.

**Miriyê li ser piyan e:**
- Belengaz e; tiştek pê nabe; pir nexweş e.

**Miriyê li nava saxan e:**
- Rewşa wî pir giran e.

**Mirin jê re bûye zêrê zer/mirin jê re zêr e:**
- Perîşan bûye; ketiye ser dest û lingan; bimire jê re baştir e.

**Ne dimire ne dijî:**
- Perîşan bûye; rezîl bûye; li ber mirinê ye.

**Nikare stûyê du dîkan ji hev veke:**
- Pir belengaz e; bêdesthilat e.

**Nikare stûyê du bizinan ji hev veke:**
- Pir belengaz e; bêdesthilat e.

**Rih û simbêl tevlîhev bûne:**
- Belengaz bûye; êdî nikare li xwe binêre.

**Serjinik e/serpîrejin e:**
- Weke jinan serê xwe ditewîne.

Stûxwar e:
- Belengaz e; perîşan e; hatiye tirsandin; her kes dikare neheqiyê lê bike.

**Teyr çavên wî dertînin:**
- Belengaz e; pir perîşan e; nikare xwe biparêze.

**LI SER BIHEVÇÛNÊ**

**Dev li hev kirin:**
- Gotinên pir nebaş ji hev re gotin; bi awayekî pîs bi hev çûn.

**Gotin dan rûyên hev:**
- Gotinên nebaş ji hev re gotin; bi hev çûn.

**Hev anîn qaqa reş:**
- Bi hev çûn; şerê hev kirin; hev pir êşandin; hev perîşan kirin; qira hev anîn.

**Hev sorûbeşo kirin:**
- Pir li hev xistin; xwîn ji hev anîn; hev pir êşandin.

**Li ber pozê hev rabûn:**
- Bi heman wateyê.

**Pozê xwe dan hev:**
- Li ber hev rabûn; ji bo ku bi hev biçin pir nêzîkî hev bûn.

**Senîmenî anîn serê hev:**
- Hev rezîl kirin; ti nema ku neanîn serê hev; gotinên pir giran ji hev re gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Lûtkeya NATO’yê bo Şera davikeke siyasî yan serkeftineke dîplomatîk e?



Her ku hikumeta demkî gavên mezin di çarçoveya navdewletî de diavêje, erkê wê û ihtîmala ketina nav davikên herêmî mezintir dibe. Lûtkeya NATO'yê û planên wê di dema heyî de ji bo Rojhilata Navîn xeternak in û dibe ku di nav van planan de lingê hikumeta demkî bişemite nav kirîzeke bêserûber.**R-6**

## Jiyan Hisên: Kampanya piştgiriya YPJ’ê heta pêkanîna armancan berdewam e



Di 26'ê Nîsanê de çalakvan û tevgerên jin ji bo piştgiriya YPJ'ê kampanyayek dan destpêkirin, ev kampanya bi armanca naskirina rola jinê di Sûriyê de û misogerkirina hebûna YPJ'ê di Wezareta Parastina Sûriyê de, hate destpêkirin û wiha got: “Heya ku armanca me pêk were, wê ev kampanya berdewam bike.”**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1394 15-Tîrmeh-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S




## Landika şoreşê û cihê têkbirina DAIŞ’ê Kobanê ye, ne Eyn El-Ereb e

Guhertina navê Kobanê bo Eyn El-Ereb dîsa bûye rojev. DAIŞ'ê xwest navê wê bike Eyn El-Îslam, berî wê jî rêjîma Baas û niha jî hikumeta demkî ya Sûriyê dixwazin navê Kobanê bikin Eyn El-Ereb. Ev hewildan berdewamiya siyaseta erebkirinê ye ku armanca wê jêbirina nasnameya dîrokî û çandî ya Kurdan e...**R-5**

# RÊWÎTIYA 14 SALAN A ŞOREŞA 19’Ê TÎRMEHÊ

Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de çirûska yekemîn a şoreşê li Kobanê vêket û li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû bingeha qonaxeke nû. Di 14 salan de şoreş bi xweparastin, Rêveberiya Xweser, komîn û meclisan, ziman, çapemenî û berxwedana li dijî DAIŞ û dagirkeriyê pêş ket. Îro jî di nav pêvajoya peyman û entegrasyonê de, parastina destkeftiyên şoreşê mijarên herî girîng in.**R-4**





## Zindawerên çand û hunera Kurdî

Hunermendê nemir Erdewan Zaxoyî yek ji wan dengên Kurd e ku şopeke kûr a hunerî û neteweyî li dû xwe hişt, tevî jiyaneke kurt û trajîk, bû dengê azadî û azara gelê Kurd.**R-9**

## Ragêşiya Îran û Amerîka piştî lûtkeya NATO’yê zêdetir bû

Ji 7'ê Tîrmehê ve pêleke êrişan ya nû di navbera Îran û Amerîkayê de hat destpêkirin. Di encamê de bi dehan cihên stratejîk li Îran û Kendava Erebî hatine hedefgirtin û hîna jî ev êriş berdewam in.**R-3**





Aştî çandeke... Farûk Sakik R-4

Dîrok bîra civakan e Rênas Efrîn R-7

# Jiyan Hisên: Kampanya piştgiriya YPJ'ê heta pêkanîna armancan berdewam e

Di 26'ê Nîsanê de çalakvan û tevgerên jin ji bo piştgirya YPJ'ê kampanyayek dan dest pê kirin, ev kampanya bi armanca naskirina rola jinê di Sûriyê de û misogerkirina hebûna YPJ'ê di wezareta parastina Sûriyê de hate destpêkirin û wiha got: "Heya ku armanca me pêk were wê ev kampanya berdewam bike."

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Kongreya Star di roja Yekşemê 26'ê Nîsanê de bi daxuyaniyekê kampanyayek ji bo piştgiriya Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ'ê) da destpêkirin, di gavekê de ku armanca wê xurtkirina piştgiriya gel û saziyan ji bo rola van yekîneyan di parastina civakê û parastina mafên jinan di Sûriyê de ye. girêdayê vê mijarê endama Koordînasyona Kongira Star a Rojava Jiyan Hisên ji Rojnameya me re axivî.

**'Yekîneyên Parastina Jinan îradeya jinan û hêza civakê temsîl dikin'**

Endama Koordanîsyona Kongira Star a Rojava Jiyan Hisên diyar kir ku "Ji dema ku şoreşa Rojava hate destpêkirina me gelek destkeftî bidest xistin yek ji wan Yekîniyên Parastina Jin bû, ku ew bi armanca parastina axê, bidestxistina mafê jina kurd û parastina hebûna wê di nava civakê de hate avakirin. Dema ku jinên kurd çav li YPJ'ê ketin û dîtin ku çawa xwe avakirin e û çawaniya birêxistina wan, ew îlhama xwe ji wan girtin ku êdî ew jî rola xwe di hundirê civakê de derxînin di hemî waran de çi ji aliyê siyasî, civakî, çandî û rêxistinî be. Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ'ê) îradeya jinan



û hêza civakê temsîl dikin, rola wan li gelek eniyan derketiyê pêş. Her hewldanek ji bo hedefgirtin an jî tehmîşa jinan û hêzên wan bi ser neketiye, tekez li ser berdewamiya vê têkoşînê kir û tekez kir ku YPJ'ê bûye modelek gerdûnî ya hêz û berxwedanê.

Şervanên jin ên di van yekîneyan de ji bo parastina civaka Sûriyeyê û tevahiya mirovahiyê bedelên giran dane. Wan di kampanyayên parastina bajar û gundan de û di rûbirûbûna terorîzma ku jinan ji her tiştî bêtir hedef digirt de, şehîd û birîndar dane. Rola van yekîneyan ne tenê bi aliyê leşkerî ve sînordar bûye, wan hêzek exlaqî û civakî jî ava kiriye ku beşdarî parastina jinan ji tundûtûjî û tundrewiyê bûye û nirxên beşdarbûn, wekhevî û edaletê ava kiriye. Hebûna Yekîneyên Parastina Jinan di nav artêşê de garantiya pabendbûna artêşê bi prensîbên xwe re di şiyana parastina aştî û ewlehiyê de ye. Herwiha, hebûna jinan di artêşê de ne tenê bi erkên parastinê ve sînordar e, lê têkoşîna ji bo guhertina zîhniyeta ku îrade û mafên jinan red dike jî di nav xwe de digire. Li ser vê yekê, parastina taybetmendiya van yekîneyan wekî hêzek jinan a pispor pêdivîyek neteweyî ye, ji ber ezmûna wan a dirêj di şerê li dijî terorîzmê, parastina jinan û beşdarbûna di parastina ewlehî û aramiyê de. Ev yek her wiha naskirina rol, dîrok û qurbaniyên wan misoger dike. Ji bo vê me kampanyayek bi dirûşmeya "Em hemû YPJ'ê ne, YPJ'ê hebûna me ye" dest pê kir ew armanc dike ku Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) di nav Wezareta Parastinê ya Sûriyeyê de bi fermî werin naskirin. Kampanya, ku di 26'ê Nîsanê de hatiye destpêkirin, rêzeçalakiyên giştî, semîner, mîtîng û meşan li gelek bajarên Rojava dihewîne."

**'Kampanya rêzek berfireh ji çalakiyên ku armanc dikin rola YPJ'ê derxînin pêk tê'**

Jiyan Hisên anî ziman ku armanca wan ji vê kampaniyê piştgiriya hêzên jin e û wiha pê de çû: "Em deyndarê keda şervanên YPJ'ê ne, ji destpêka şoreşa Rojava ve, ew bi parastina rûmet, xak û mafê jinê rabûne. Di heman demê de piştî hilweşîna Rêjîma Baas û hatina hikûmata demekî li şûna wan rewşa Sûriyê bi giştî hate guhrtin û derbasî qonaxeke nû bû, herwiha kurdên li Rojava jî di vê demê de di gelek şert û mercên zehmet re derbas bûn û ji şerên giran derketin. Û piştî lihevkirina 29'ê çileya 2026"an de a di navbera QSD' ê û hikûmata demkî de peymana 29'ê Çileyê hat îmzekirin. Di peymanê de rastiya Hikûmetê hat dîtin, ku çawa ew xwedî hişmediyekê cîhadîst û mêra ye û hebûn û mafê jinê qebûl nakin, ji bo vê jî dema me zihniyeta wan dît ku çawa mafê jinê nadinê û bi taybet hêzên me yên Yekîniyê Parastina Jin tên paşguhkirin û hebûna wan nayên qebûl kirin, me weke rêxistin û tevgerên jin ên Rojavayê Sûriyê biryara detpêkirina kampaniyeke piştgiriyê kir.

**Kampanya dengvedanek çêkir**

Jiyan Hisên got ku Kampaniya ku me dabû destpêkirin ne tenê li ser asta Sûriyê an Rojavayê Kurdistanê, lê li her çar parçeyên Kurdistanê û tevahiya cîhanê belav bibe, herwiha piştî civîneke sazî û tevgerên jinên Rojava di 26'ê Nîsana 2026"an de ev kampaniya piştgiriya YPJ'ê bi dirûşmeya "Em hemû YPJ'ê ne, YPJ'ê hebûna me ye" me ragihand. Kampanya rêzek berfireh ji çalakî û bûyerên ku armanc dikin hişyarkirina rola Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) û berfirehkirina hevgirtina bi wan re hem li herêmê û hem jî li navneteweyî dihewîne. Di çarçoveya vê kampanyayê de, ji bo piştgiriya kampaniyayê, hem li hundir û hem jî li derveyî welêt konserên taybetî hatin organîzekirin, digel pêşangehên wêneyan ên ku ezmûn û rêwîtiyên şervanên jin belge dikin. Herwiha rêzeçalakiyên cuda ji meş, mitîng, komxebatan û çalakiyên hunerî jî tên li dar xistin. Li bajarên Qamlşlo, Hesekê, Çil Axa, Til Temir û Zirgan, digel deverên din, gelek çalakî hatin lidarxistin ku jin û nûnerên rêxistinên sivîl û civakî beşdar bûn. Pankart û wêneyên şervanên jin ên Yekîneyên Parastina Jinan hatin bilindkirin ku, li gorî organîzatorên kampanyayê, girîngiya parastina rola ku yekîneyan di salên şerê li Sûriyeyê de lîstine tekez dikirin.."

Di dawiyê de, Endama Koordînasyona Kongira Star a Rojava Jiyan Hisên banga naskirina van yekîneyan û entegrekirina wan di pergala ewlehiyê ya Sûriyeyê de kir û îdia kir ku her hewldanek ji bo tehmîşa wan derxistina rola jinan e. Wê parastina berdewam a vê hebûnê û daxwaza mafên jinan di her çarçoveyek destûrî ya pêşerojê de piştrast kir, herwiha kampaniya wê jê jî berdewam bike.

# 'Weqfa Jina Azad tevahiya jinan hembêz dike'

**Aryen Hesen/Qamişlo**

**Rêveberiya projeya Weqfa Jina Azad Viyan Elî diyar kir ku Weqfa Jina Azad hemû jinan de nava xwe de digire û deriyê wê ji wan re vekirî ye û wiha got: "Em rêxistineke serbixwe ne."**

Weqfa Jina Azad rêxistineke jine ku hemû jinan di nava xwe de digire û ji bo perwerdekirin û pêşxistina wan xebatên cûr bi cûr dimeşînin. Armanca sereke ya weqfa jinê guhertina zihniyata ku li dijî jinê tê meşandin û azadkirina jinî ye.

**''Weqfa Jina Azad rêxistineke serbixwe ye''**

Viyan Elî da xuya kirin ku derdora 150 jin di Weqfa Jina Azad de xebat dikin û wiha got: "Weqfa Jina Azad di 2014'an de hate avakirin destpêkê bi çar jinan dest pê kir, lê niha derdora 150 jin cihê xwe di Weqfa Jina Azad de digirin. Em gelek li jinan geriyan, me ew kom kirin, sardana wan kirin û birêxistin kirin. Bi armanca pêkanîna xwasteka jinan me perwerdeya fêrkirina terzî, kowefêra, çêkirina sof û hwd vekir. Herwiha komîteyên perwerde, tenduristî û dîplomasî ji bo têliliyên me bi Ewropa û kesên têlildar re vekir. Pirana perwerdeyên me li ser tundiya li ser jinê, malbat, zawaca temen biçûk û hemû mijarên têkildarî jinê ne. klînîk û dermanxaneyên me li Hesekê û Qamişlo hene ku bijîşkên têkildarî jin û zarokan lê amade ne, li ser xeta sînoran klînîk û dermanxaneyên me yên gerok hene, ji bo jinên ku nikare xwe bighîne me em xwe bighînin wan, li cihên ku şer lê hene jî em xwe dighînin wê derê ji bo alîkariyê. Di heman demê de em dermanan bê berdêl didin û em dermanên xwezayî li Amûdê û Hesekê amde dikin.

Hemû perwerde û komîteyên me waneyên xwe di milê teorî û pêkanîn pratîkî de ne. Di nava Weqfa jin de lênêrîna zarokan, ji bo derûniya zarokan li herêmên ku şer lê hene em perwerdeya mûzîkê amade dikin, amûrên mûzîkê li gorî daxwaza wan peyda dikin. Werzîşxane ji bo derûnî û denduristiya jinê jî heye. Li Kobanê cihê me yê ji bo zarokên sêwî heye, ji bo peydakirina hemû pêdiviyên wan em berpirsyarin. Çalakiyên cûr bi cûr ji bo zarokan lidardixin. Hemû kar û xebatên jin ku Weqfa jina azad de dikin, em bi rêya Pêşangehan pêşkêş dikin. Ji ber ku em rêxistinike serbixwe ne, aboriya me jî cûda ye, her kar û xebatê di mile terzî, dirûtin, kuafûr.. hwd de dikin em aboriya xwe ji wê yekê derdixin. Em rêxistineke civaka sivîlin."

**'Armanca sereke ya Weqfa Jina Azad guhertina fikir û azadkirina jinê ye'**

Viyan Elî destnîşan kir ku Weqfa Jina Azad derfeteke mezine ji bo hemû jinan e û wiha pê de çû: "Weqfa Jina Azad xebata xwe li her bajarekî Rojava dimeşîne û di heman demê de li şam û Helebê, Li Tebqa, Reqa û Minbicê jî me xwe rêxistin kir, lê di encama şer de xebatên me li wê derê rawestî. Niha piraniya xebatên me li herêmên Kurdî tên meşandin, lê em hewaldidin ku li herêmên dîtir jî vebikin. Di destpêkê de rola jinan di kar de tune û yê herî zêde di şeran de dibe qurbanî jine, weqfa jina azad derfeteke mezin ji bo jinan bû, bi jinan re bû alîkar, bi hezaran jin perwerde kirin, di haman demê de armanca sereke ya weqfa jin azadkirina jin û guhertina fikira zayendperest e. Di her warî de em dixwazin ku rola jinê xuya be û ji bin kevneşopiyên ku mafê wê tune dike derkevin. Weqfa jina azad derfeteke mezin ji bo jinan ne ku hişt jin liberxwe bide, mafê xwe nasbike di milî aborî de jî xwe xort bike."



**'Deriya Weqfa jina azad ji hemû jinan re vekirî ye'**

Rêvebera Projeya Weqfa Jina Azad Viyan Elî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di planên me yê dema pêş de heye ku em Weqfa jina Azad li gelek bajarên Sûriyê vebikin û dîsa careke din hewalbidin vegerin Tebqa, Reqa û minbicê jî, ji ber ku em dixwazin nêzî hemû jinan bibin. Weqfa jina azad deriya wê ji hemû pêkhate û jinan re vekirî ye, em dixwazin bighêjin hemû jinan da ku jin liberxwe bidin, mafê xwe nasbikin û karibin di milê aborî de xwe hîn zêdetir xort bikin."



# Yekîtiya Ewropayê cezayên nû li ser Rûsya ferz dike

Wekî beşek ji hewildanên zêdekirina zextê li ser Moskowê û qelskirina şiyana wê ya ji bo berdewamiya şer, Yekîtiya Ewropayê cezayên nû li ser Rûsyayê ragihand û tê de 250 kes û sazî hedef digire. Ewropayê ev gav wekî mezintirîn cezayan ji destpêka şerê di navbera Rûsya û Ukraynayê de bi nav kir.

**Navenda Nûçeyan**

Yekîtiya Eropayê di civîneke wezîrên derve de, tekez kir ku cezayên nû ku ew wekî "stûna darayî ya makîneya şer a Rûsyayê" bi nav dike hedef digirin, hate destnîşan kirin ku her tedbîrek nû armanca wê sînordarkirina çavkaniyên ku Moskow xwedispêrê ji bo fînansekirina operasyonên xwe yên leşkerî, ye.

**Nakokiyên di nav yekîtîyê de**

Piştî danûstendinên berfireh di navbera welatên endamê Yekîtiya Ewropayê de, ev lihevkirin hat, herwiha di nava nîqaşan de li ser hin bendên koma 21'an ji cezayan, nemze tedbîrên girêdayî sektora barkirina darayî û sînorkirinên ku li ser hinardekirina enerjiya Rûsiyê hatiye ferz kirin, nakokî derketin holê.

Yûnanîstan, Qubris û Malta li ser hin pêşîniyaran fikarên xwe anîn ziman, ji ber bandora wan li ser berjewendiyên wê yên aborî, ev helwest berî ku wezîrên derve bighêjin lihevkirineke serkeftî di derbarê koma cezayên nû de, hat nîşan dan, bi berdewamiya nîqaşên li ser temamkirina koma 21'an a cezayan di çarçoveya berfirehkirina cezayên aborî li ser Rûsiyayê.

**Berfirehkirina çarçoveya zextan**

Yekîtiya Ewropayê diyar kir ku koma cezayê nû, ligel yên pêşbînîkirî, çarçoveya tedbîrên li ser Moskowê ferzkirî berfireh dike, hat tekezkirin ku siyaseta cezayan dê bi armanca kêmkirina şiyana Rûsyayê ya ji bo derbaskirina sînorkirinên Rojavayî bedewam be, di heman demê de hedefgirtina kesayet û saziyên ku piştgiriya darayî an lojîstîkî didin hewldana leşkerî ya Rûsyayê.

Ev tevger beşek ji rêze tedbîran e ku ji destpêka şer di Sibata 2022'an de ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve hatine girtin, di nav wan de sektorên darayî, enerjî, parastin û teknolojiya, wekî din bi sedan ji berpirsyar, kompanî û saziyên Sûriyayê, dihewîne.

**Cezayên hevbeş bi Birîtaniyayê re**

Di heman demê de, Yekîtiya Ewropayê û Brîtanyayê cezayên nû li dijî Rûsyayê ji ber tohmetên pêkanîna êrişên sîber bi armanca "belavkirina kaos û dabeşbûnê li Ewropayê, raghandin.

Londonê li ser 24 kes û saziyên girêdayî karûbarên îstîxbarata Rûsyayê ceza danî, di heman demê de Yekîtiya Ewropî li ser 13 kes û saziyên ku di nav wan de efserên karûbarê îstîxbarata leşkerî ya Rûsyayê (GRU) jî hene, ceza pesend kir, ev kes bi beşdarbûna di çalakiyên sîber de têne tawanbarkirin, Bruksel û Londonê gotin e ku ew ewlehî û aramiya Ewropayê tehdît dikin.

Sepandina hevdem a cezayên aborî û sîber meyla Ewropî ber berfirehkirina amûrên zextê li



ser Moskowê nîşan dide, da ku aliyên darayî û ewlehiyê di heman demê de di nav xwe de bigire, di çarçoveya şerê berdewam ê li Ukraynayê û zêdebûna rageşiyên di navbera Rûsya û Rojava de.

**Zextên berdewam**

Ji destpêka şerê Rûsya-Ukraynayê di Sibata 2022'an de, Yekîtiya Ewropayê 20 komên cezayan li ser Moskowê ferz kiriye, ku sektorên darayî, enerjî, parastin û teknolojiyê, digel bi sedan berpirs, karsaz û saziyên Rûsî hedef girtine.

Di nava tedbîran de cemidandina mal û milkên Rûsyayê, qedexeyên seferê û sînordarkirinên li ser hinardekirin û hawirdekirinê, digel dûrxistina bankayên Rûsyayê ji pergala darayî ya navneteweyî û danîna sînorek li ser bihayê nefta Rûsyayê bi hevahengiya G7'ê, di nav xwe de digirtin, da ku çavkaniyên darayî yên ku Moskow ji bo fînansekirina şer xwedispartiyê kêm bikin.

# Misir...Goristaneke kevnar ku temenê wê vedgere 3 hezar sal hat vedîtin

**Navenda Nûçeyan**

**Wezareta Geştiyariyê û Şûnwaran a Misrê raghand ku li herêma bejahiya rojavayê bajarê Eqserê li Misirê, goristaneke kevnar ku dîroka avabûna wê vedgere serdema Reamîse(Remsîs) hat vedîtin.**

Şandeyeke ya şûnwaran a Holendî li bajarê Eqserê başûrê Misirê, goreke nû ku navê wê "Basir" e dema ku ew herêm dihat kolandin, hat dîtin. Li gorî ku Wezareta Geştiyariyê û Şûnwarên Misrê diyar kir şandeya şûnwarên Holendî li Cebana Teyba dixebitî, bi serokatiya Dr. Karina Van Den Hoeven, ji zanîngeha Leidenê, di heman demê de gorîstan li herêma jêrîn ya Şêx Ebdulqerne ya bejahiya rojavayê bajarê Eqserê hat keşf kirin.

Wezîrê Geştiyariyê û Şûnwarên Misrê Şerîf Fethî tekez kir ku



hewldanên şandeyên şûnwarî ku li Misrê dixebitin, dê dibe alîkar di keşfkirina sirên şaristaniya Misrê yên kevin, herwiha destnîşan kir ku ev yek dê cihê Misirê wekî navendek cîhanî xurt bike.

Gorîstana ku hatiye keşfkirin li Rojhilatê gorîstana Teyba ya hejamara 45 e, tîma ku dixebite projeyeke lêkolînê û meydanî ji sala 2018'an ve bi hevkariya Wezareta Geştyariyê û Şûnwaran, bi armanca bicih anîna bernameyên parastinê û rêvebirina metirsiyên li herêmê, pêk tîne.

Dema ku gorîstan dihat lêkolînkirin, hat naskirin ku ev gorîstan ya kesekî ye navê wê Basir e û li gorî şêwaza hunerî ya nivîsên li ser gorê, dibe ku ew vedigere serdema Reamîse.

Wezaretê tekez kir ku tîm dê xebata xwe ya lêkolîn û belgekirinê di nav goristanê de bidomîne, bi armanca naskirina kesên ku li wir hatine veşartin û ji nû ve avakirina nasnameyên wan ên kesane, digel lêkolîna goristanê di çarçoveya wê ya dîrokî û arkeolojîk de, ku dê bibe alîkar ji bo gihaştina têgihîştinek kûrtir a têkiliya di navbera goristanên herêmê û jîngeha hawîrdora wê, di heman demê de balkişandina li ser pêşketina dîrokî û çandî ya herêma jêrîn a Şêx Ebdulqurne.

**Şêweyê gorê**

Li gorî şêwaza hunerî ya cihêreng a nivîsên neqişandî yên li ser gorê, pispor bawer dikin ku ew vedigere serdema "Reamîse", ku di navbera her du malbatên nozdeh û bîstan dirêj dibe.

Gor li rojavayê cihekî goristanê yê naskirî ye, ew girêdayî şêwaza kevneşopî ya gorên Teyba ên ji serdema Dewleta Nû (1570-1069 BZ) ye.

Arkeologan di hewşê de çend taybetmendiyên mîmarî keşf kirin, hewşek derve ku ber bi cihekî nimêjê ve ku li ser kevir bi şiklê "T" ya berevajîkirî ve diçe û odeyên goristanê binê wê hatine kolandin. Herwiha di nav wan de kursiyek ji kelpîçên heriyê ku dibe ku ji bo tesbîtktiina tabloya cenazeyê hatibe bikar anîn, derenceyek ku ber bi derî ve diçe. Li hundir, neqşên bi navê "Basir" ku wî nîşan didin ku di perestgehan de ji cûrbecûr xwedayan nimêj dike, herwiha bi jina xwe re li ber maseyek qurbaniyan rûniştiye.

Ji aliyê xwe ve, Dr. Karina Van Den Hoeven, seroka şandeyê ji Zanîngeha Leidenê, piştrast kir ku şande dê di demsalên pêş de dest bi xebatên xurtkirina avahîsaziyê, lênêrîn û sererastkirinê li ser xemlên rengîn ên di gorê de pêk bîne, hêviya xwe anî ziman ku xebata xwe li wir bidomîne û di demsalên pêş de bêtir vedîtinên arkeolojîk bi dest bixe.

# Saeta aştiyê ya ku sekiniye; Gelo Tirkiyê dê derfeta dîrokî ya ji bo çareseriyê ji dest bide?

Cemîl Xoce

Gelo pireke mezin a ku du qeraxan bi hev ve girê dide dikare bê avakirin, eger xebat di nîveka rê de hatibe rawestandin? Bêguman na. Ev rewşa îro ya pêvajoya aştiyê ya di navbera Tevgera Azadiyê ya Kurd û dewleta Tirk de ye. Pêvajo bi temamî rawestiyaye. Sedem jî diyar û zelal e: Aliyek hemû gavan diavêje, aliyê din jî tu gavekê naavêje. Ev tengaviyeke siyasî ya temam û balkêş e.

Gavên wêrek bê bersiv dimînin

Di sala borî de, Tevgera Azadiyê biryarên dîrokî û wêrek girtin. Ew biryar îfadeya îradeyeke rastîn a ji bo guhertinê bûn. Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) bi awayekî fermî xwe fesh kir. Têkoşîna çekdarî ya ku weke stratejiyeke mayînde bû, bi dawî kir. Kar gihişt wê astê ku çek li ber çavên cîhanê di dîmeneke sembolîk de bişewitînin. Ew ne tenê gotin bûn, lê kiryarên rastîn ên li ser erdê bûn.

Ji wê zêdetir, tevgerê hêzên xwe ji herêmên bakur vekişandin cihên dûr. Armanca vê vekişînê ew bû ku ji her cure pevçûnekê re ku dibe bandorê li ser rêya aştiyê bike, rê neyê dayîn. Armanc gelek zelal bû: Em çareseriyeke siyasî û demokratîk dixwazin. Em dixwazin dawî li vî şerê dîrokî bînin ku her kes westandiye. Tevgerê hemû hincetên ku dewleta Tirk di paşerojê de li pişt wan xwe vedişart, ji holê rakirin. Tevgerê ji dewletê re tu hincet ji bo paşxistina aştiyê yan jî reva ji proseyeke wiha re nehişt.

Şibandina bi pireke qutbûyî

Em dikarin vê pêvajoyê bi "avakirina pireke mezin" bişibînin ku du qeraxên dûr bi hev girê dide; qeraxa dewletê û qeraxa gelê Kurd. Tevgera Azadiya Kurdistanê da ser milê xwe ku nîveka pirê ava bike; wê hemû materyalên pêwîst amade kirin, binyat kolandin û rê ji bo gihîştina qeraxa din vekirin. Ew gavên wêrek û berbiçav bûn ku armanc jê gihîştina herêmeke ewlehiya hevbeş bû.

Lê ya îro diqewime, ew e ku pira di nîveka rê de bi temamî rawestiyaye. Tevgera Azadiyê li ser devê pirê radiwestiyaye û li bendê ye ku dewleta Tirk destê xwe dirêj bike û nîveka din temam bike. Berevajî vê, em dibînin ku dewlet ji dûr ve temaşe dike û pirê di nav hewayê de daleqandî dihêle. Avakirina pirekê ji aliyekî ve, li gorî hemû pîvanan karekî ne gengaz e. Ev rewş peymanên aştiyê yên cîhanî tîne bîra me; ku serkeftin her tim bi prensîba "gav bi gav" ve girêdayî bûye. Di dîroka nakokiyên nûjen de nehatiye dîtin ku pêvajoyeke aştiyê bi ser bikeve, dema ku aliyek hemû tawîzan bide û aliyê din di dîwarên xwe yên tecrîdê de asê bimîne.

Çima dewlet red dike ku tevbigere?

Tevî van gavên ku tevgerê û Rêber APO avêtine, em dewleta Tirk di rewşeke girtîbûna temam de dibînin. Çima ev diqewime? Bersiv ne di nebûna îmkanan de ye. Dewlet xwedî parlementoyeke xurt e, xwedî dezgeh û biryara siyasî ye. Lê belê, wisa dixuye ku "daxwaza" aştiyê bi temamî kêm e. Daxwaz motora sereke ya her karekî ye û bêyî wê, qanûn tenê li ser kaxezê dimînin.

Hin baskên di nav dewletê de bi hişmendiyeke gelek kevn difikirin. Ew her tim dixwazin tenê demê derbas bikin. Bawer dikin ku dirêjkirina temenê pêvajoyê dê bibe sedema lawazkirina tevgerê yan jî qelskirina hêza wê. Ev xwendineke şaş a rastiyê ye. Ew fêm nakin ku pirsgirêka Kurd êdî ne tenê şerekî çekdarî ye. Ew bûye hişmendiyeke kûr a di nav gel de. Ne mimkun e ku gelek bi temamî were înkarkirin an jî pirsgirêka wî bi paşxistinê were marjînalîzekirin.

Rola muzakerevanê sereke

Di dilê vê pêvajoyê de, Rêber Ocalan muzakerevanekî sereke ji bo çareseriyê ye. Ne mimkun e ku mirov serkeftina vê pêvajoyê bêyî wî bifikire. Tevgerê gelek caran ragihandiye ku Rêber Ocalan ew tekane muzakerevanê ku gel pê bawer e. Lê tevî vê yekê, dewlet tecrîdeke giran li ser wî ferz dike. Dewlet çawa ji kesekî daxwaza çareserkirina pirsgirêkeke sedsalî dike di heman demê rê li ber hêsantirîn rêbazên ragihandinê yên wî digire? Ev mentiq nayê fêmkirin. Eger daxwazeke rastîn ji bo aştiyê hebe, gava yekem bidawîkirina vê tecrîdê ye. Azadiya fizîkî ya Rêber Ocalan daxwazeke pêwîst e, da ku gelê Kurd ciddiyeta pêvajoyê hîs bike.

Tecrîd û metirsiya bêîstiqrariyê

Berdewamiya tecrîdê ne tenê tedbîreke ewlehiyê ye, lê peyameke neyînî ye ku alozbûna rewşê zêdetir dike. Dema ku deriyên diyalogê li ber muzakerevanê sereke tên girtin, deriyên guman û dudiliyê vedibin. Ev nêzîkatî li şûna ku aloziyan kêm bike, wan xurt dike. Tecrîdkirina Rêber Ocalan rê li ber pêşketina pêvajoyê digire. Dewlet ji bo aramkirina rewşê û avakirina paşerojeke hevbeş pêwîstiya wê bi rêbertiyê heye. Ev reftar di nav her kesî de pirsên rastîn derdixe holê: Gelo dewlet bi rastî aştiyê dixwaze? Yan tenê dixwaze li ser hesabê xwîna gelan demê qezenc bike?

Metirsiya windakirina dîrokê

Dîrok efû nake wan kesên ku derfetan ji dest didin. Her rojek ku bêyî avêtina gavên berbiçav derbas dibe, windahiyeke ji bo paşeroja nifşên pêşerojê ye. Windakirina demê di nav hesabên teng û taktîkên erzan de dê tenê aloziyên zêdetir bîne. Cîhana li dora me diguhere û avhewaya siyasî ya herêmî ji bo rûbirûbûna pirsgirêkên li pêş pêwîstiya wê bi wêrekiyekê heye. Dudiliya dîrokî ya îro dê dewletê mahkûm bike ku dema saeta aştiyê lê da, ew ne li gorî berpirsyariyê bûye.

Bijareya aştiyê


Dewlet îro mecbûr e ku biryarekê bide. Yan divê ji çembera dudilî û hesabên teng derkeve û deriyê diyalogê bi ciddiyeta mutleq veke, yan jî di girtibûna xwe ya kujer de bimîne. Aştî ne xêra ku tê dayîn e, lê biryareke siyasî ya wêrek e ku pêwîstiya wê bi îradeyeke rastîn a qebûlkirina yê din heye. Tevgerê hemû destpêşxeriyên xwe pêşkêş kirin. Top niha di qada dewletê de ye. Eger hişmendiya ewlehiyê neguhere, aştî dê wekî xewneke dûr bimîne û her kes dê di çembera şer de ku paşerojê dixwe, asê bimîne.

Aştî pêwîstiya wê bi îrade û wêrekiyê heye ji bo avakirina paşerojê. Tevgerê bi hemû dilsoziya xwe destê xwe dirêj kir, lê pir hîn jî qutbûyî ye. Gelo dewlet xwedî vê îradeyê ye ku destê xwe dirêj bike û rê temam bike? Tenê rojên pêş dê bersiva vê pirsa dijwar bidin.

# Em bi YPJ'ê azad in

Aya Idrîs Elmecîd

Hêzên yekîneyên parastina jin Ypj ev hêz bi îdeolojî , zanist û çeka xwe li seranserî cîhanê dengvedan , ji ber ku dema em dibêjin Ypj ' ne tenê hêzeke leşkerî tê bîra me , ew bi xwe hêzeke jinan û civakê ne. Ji ber ku artêşa herî bi hêz ew artêşa bi civaka xwe hatiye ava kirin ku civak piştgiriyê wê dikin û hêzên YPJ'ê ji xwere esas digirin , lewma YPJ' jî dibêje em bi civaka xwe bi hêzdibin ne bi çeke xwe Ji ber ku YPJ'ê



ew şerê yekemîn kir şerê zihniyeta baviksalarî kir û bi serket û tevahî jinan ji wê zihniyeta bavik salarî rizgar kirin ku di encam de jinan xwe di beşên siyasî,leşkerî, civakî ,aborî , kar û xebat dan meşandin û xwe ispat kir ev jî yek ji wan destkeftiyên pîroz yên ku YPJ'ê di şoreşa rojava de bi dest xist, me dît ku çawa jin ji hemû pêkhateyên , Kurd , Ereb , Ermen , Suriyan , cihê xwe di nava hêzên YPJ'ê de girt û ji hemû jinên cîhanê re bûn mînaka azadî û lehengiyê " heyanî " ku jinên enternasiyonel jî berê xwe dan nav refên YPJ'ê û li ser fikra wî xwe perwedekirin. hêza jin axa Rojava ji çeteyên herê xeternak DAİŞ'ê parast. Di demekî de ku hêzên derva nediwêriyan xwe nêzê DAİŞ'ê bikin, YPJ'ê bi îradeya xwe û bi berxwedaniyeke xort, di çeperên şer de cîh girtin û parastina rûmeta gelên xwe kirin mîna şehîd Arîn mêrkan ,Viyan piyman û Zehra Penaber. Her jinek Ypj ê destanek lehengî bi mohra xwe di dîrokê de nivîsandin, gel û civaka jî bûn şahidê vê yekê, îcan niha hukmeteke hatiye ku êdî bi navê hukmeta demkî tê naskirin hîn nebûye hukmetek daim û serê xwe ji lingê xwe ve nas nake dibêje : ez hêzên YPJ'ê qebûl nakim wateya ev gotina wî ku civakê bi xwe qebûl nake . Çimkî civak dibêje Ypj 'ê hebûna meye , ji xwe her kes bi çavên mêze kir gel û civak li rojavayê kurdistanê û Ewrûpayê ewqas çalakî û piştgirtî dan hêzên yekîneyên parastina jin ypj hate ispatkirin ku gel û civak li pişta ypjê ne , ne mîna hukmeta demkî û hemzat û emşat ku tenê terorîstên Tirkiyê pişta wîne , çi dibe bila bibe em ji dû hêzên xwe ypj'ê venagerin çimkî me şoreşa xwe bi hêzên jinan da avakirin , em bi ypj' hene.



# Ragêşiya Îran û Amerîka piştî lûtkeya NATO'yê zêdetir bû

Ji 7'ê Tîrmehê ve pêleke êrişan ya nû di navbera Îran û Amerîkayê de hat destpêkirin. Di encamê de bi dehan cihên stratejîk li Îran û Kendava Erebî hatine hedefgirtin û hîna jî ev êriş berdewam in.

Navenda Nûçeyan

Ragêşiya şerê Îran û Amerîkayê dest pê kir dema ku êriş li Tengava Hurmizê pêkhat. Desteya Çalakiyên Bazirganiya Deryayî ya Brîtanyayê (UKMTO) di 7'ê Tîrmehê de ragihand ku keştiyek din dema ku di Tengava Hurmizê re derbas dibû hat hedefkirin. Bi vê yekê di 24 saetan de 3 êriş li tengavê tên kirin. Desteyê destnîşan kir ku keştî bi droneke nenas hatiye hedefkirin. Di nava seaetên dawîn ên 7'ê heman mehê de gaza xwezayî ya şilekirî ya Qeterê û keştiyek petrola xav a bi ala Erebistana Siûdî li nêzî Tengava Hurmizê zirar dîtin. Her du keştî dema di kerîdora deryayî re derbas dibûn, bi mûşekan hatin hedefkirin, herwiha di 24 saetan de 3 êriş li Tengav a Hurmuzê li dijî keştiyan pêk hatin.

**Tevlîheviya li Hurmizê**

Di 8'ê Tîrmehê de jî şer di navbera Îran û DYA'yê derket, Amerîkayê ragihand ku Îranê êrişî keştiyên bazirganiyê kiriye, lewma wan li dijî Îranê gelek êrîşên xurt daye destpêkirin. Li aliyê din Artêşa Pasedaran a Îranê jî ragihand wan wek bersiva êrişan, li dijî 85 baregehên leşkerî yên Amerîkayê êriş pêkanîne.

Navbera DYA û Îranê êrîşên beramber pêk hatin. Televîzyona Dewletê ya Îranê diyar kir ku li bajarê Bender Abbas û Sirikê ya nêzî Tengava Hurmuzê, dengên teqînan hatin bihîstin. Herwiha CENTCOM'ê diyar kir ku sivîl hatine hedefgirtin û êrîşkariya Îranê ne di cih de ye, xeter û binpêkirina eşkere ya agirbestê ye.

Weke bersiva êrîşên DYA'yê, Artêşa Pasedarên Îranê jî diyar kir ku 85 nuqteyên leşkerî yên DYA'yê hatine hedefgirtin û destnîşan kir ku balafireke bêmirov a MQ-9 ku hewl dida mudaxeleyî operasyonê bike, hate xistin û got, agirbest bi eşkere hat binpêkirin û Peymana Îslamabad bin pê bû."

Herwiha Trump li civîna bilind a NATO'yê ya li Enqereyê civîneke çapemeniyê ya hevpar li dar xist. Trump işaret bi bûyerên dawî yên navbera DYA û Îranê kir û diyar kir ku metna mutabaqatê ya ji bo bidawîkirina şerê bi Îranê re "qediya" ye. Herwiha ragihand ku ew naxwaze hevdîtinê bi Tehranê re bike û got: "Agirbesta bi Îranê re bi dîtina min bi dawî bû. Muzakere dikare dewam bike, ne xema min e. Bi dîtina min ew derewîn e."

**Piştî lûtkeya NATO'yê pêla êrişan zêde bû**

Piştî rojekê ji pêkanîna lûtkeya NATO'yê ya 36'an ya li Tirkiyê, pêla êrişên Îran û Amerîka li Rojhilata Navîn gelekî bilind bû. Li bajarê Bûşehrê êrîşeke Amerîkî pêkhat.

Ajansa nûçeyan a Îranî Mêhr ragihand ku dengê gelek teqînên bi hêz li bajarê Bûşehrê yê li başûrê Îranê hatine bihîstin. Bajarê Bûşehrê ji ber hebûna Navenda Atomî ya Bûşehrê (yekemîn santrala enerjiya atomî ya Îranê) xwedî girîngiyeke stratejîk a mezin e.

Wezareta Tendirustiyê ya Îranê di 9'ê Tîrmehê de ragihand ku ji ber êrişên rojên dawî yên Amerîkayê, 14 kes mirine û 78 kes jî birîndar bûne. Berpirsê Navenda Peywendiyên Giştî ya Wezera Tendirustiya Îranê Husên Kirmanpur eşkere kir ku heta niha Amerîkayê li pênc parêzgehan êriş pêkanîne, ji birîndaran 47 kes di nexweşxaneyan de tên dermankirin, yên dinjî piştî dermankirinê vegeriyane malê.

**Derbeya yekem a Îran li Kendava Erebî**

Îranê di heman rojê ragihand ku wê êrişî nuqteyên leşkerî yên Amerîkayê yên li Kuwêt, Qeter, Behreyn û Urdinê kiriye. Artêşa Îranê di daxuyaniyekê de ji bo medyaya dewletê got ku wan bi dron û mûşekan pergalên parastina asîmanî yên Patriot li Kuweytê, navendeke hişyariya zû li Qeterê û depoyeke sotemeniyê ya leşkerî ya Amerîkayê li Behreynê hedef girtin., Kuwêt jî di heman rojê de ragihand ku pergalên parastina asîmanî mûşekek krûz, 3 mûşekên balîstîk û 10 dronên ku ketine qada hewayî ya wê asteng kirine û ji ber van êrişan kesek birîndar bû. Urdunê jî daxuyand ku wê hejmarek mûşek li qada xwe ya asîmanî asteng kiriye û Qeterê jî banga kêmkirina aloziyê û vegera li rêya dîplomatîk kir.

Di dawiya 9'ê Tîrmehê de Ajansa Nûçeyan a Mehr ragihand ku dengê 6 teqînan li Parêzgeha Sîstan û Belucistan ên ku dikevin Başûrê Rojhilatê Îran û çend deverên din hate bihîstin. Hate ragihandin ku Amerîka di saetên şevê de êrişî çend herêmên Îranê yên dikevin Parêzgeha Sîstan û Belucisanê, kir.

**Tengava Hurmiz hat girtin, DYA êriş kir û Îranê jî bersiv da!**

Di 12'ê Tîrmehê de Artêşa Pasedarên Îranê ragihandin ku heta destwerdanên leşkerî yên DYA'yê bi dawî nebin, ew rê nadin tu keştî di tengavê re derbas bibin. Washingtonê jî di bersiva vê de ragihand ku wan li dijî Îranê pêleke nû ya êrişên leşkerî daye destpêkirin. Artêşa Pasdarên Şoreşa Îslamî ya Îranê, bi hinceta ku destwerdanên leşkerî yên DYA'yê berdewam dikin, ragihand ku Tengava Hurmizê heta daxuyaniyeke din ji bo trafîka deryayî hatiye girtin. Fermandariya Hêzên Navendî ya DYA'yê (CENTCOM) jî diyar kir ku Îranê êrişî keştiyeke bazirganiyê kiriye û li ser vê yekê li dijî wî welatî pêleke nû ya operasyonên leşkerî dane destpêkirin.

Li gorî UKMTO'yê, êriş nêzî 9 mîlên deryayî (17 kîlometre) li rojhilatê Nîvegirava Musendam a ser bi Seltanata Omanê ve rû daye û di keştiyê de bûye sedema şewatê. Saziyê daxuyand ku, "Muretebat keştî terikandin û derbasî keştiyeke bota rizgarkirinê bûn."

**Pentagon**

Wezîrê Parastinê yê DYA'yê Pete Hegseth diyar kir ku Îranê bi gulebarankirina keştiyeke din a li Tengava Hurmizê "hilbijartineke şaş kiriye" û ragihand ku Îran bedela vê yekê bi êrişên nû yên DYA'yê dide.

Piştî daxuyaniya Serokê Pentagonê Hegseth a ku got artêşa DYA'yê wekî tolhildana li dijî gulebarankirina keştiyeke konteyneran a ji aliyê Pasedaran ve li Tengava Hurmizê, bombardûmanek li ser Îranê pêkaniye, wiha domand: "Îranê hilbijartineke şaş kir. Niha bedela vê dide."

Artêşa Pasedarên Şoreşa Îslamî ragihand ku wan di 12'ê Tîrmehê li Tengava Hurmizê li keştiyeke duyemîn xistine û ew xistine rewşeke wiha ku nikaribe were bikaranîn û got, "Bingeha Hewayî ya Stratejîk a DYA'yê ya El Udeyd a li Qetarê bi moşekên balîstîk hatiye hedefgirtin û li gel navenda lênihêrîna balafirên şer, navendên fermandarî û kontrolê jî hatine rûxandin."

**DYA: Li 140 hedefan hate xistin**

Fermandariya Hêzên Navendî ya DYA'yê (CENTCOM) ragihand ku wekî bersiva êrişa hêzên Îranê ya li ser keştiyeke bazirganiyê ya li Tengava Hurmizê, di 12'ê Tîrmehê de li Îranê nêzî 140 hedef hatine xistin.

**Tola Îranê ya duyem ji Kendavê hat hilanîn**

Piştî êrişên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) yên li ser Îranê, li herêmê rageşî hîn zêdetir bû. Piştî êrişên Îranê yên li ser Bahreyn, Qatar, Umman û Urdunê li gelek welatan, hişyarî hate dayîn.

Piştî ku DYA'yê li Îranê li gelek hedefan xist, êrişên Îranê yên ji bo bersivdanê li welatên Kendavê belav bûn. Ji ber êrişên li ser Bahreyn, Qatar, Umman û Urdunê tedbîrên ewlehiyê hatin zêdekirin.

Li gorî agahiyên ajansa nûçeyan a fermî ONA ya Ummanê, hin nuqteyên li wîlayeta Musandam a li bakurê welêt, bûn hedefa balafirên bêmirov.

**Li Qatarê 3 kes birîndar bûn**

Wezareta Karên Hundir a Qatarê ragihand ku ji ber ketina parçeyên fuzeyên Îranê yên ji aliyê sîstema parastina hewayî ve hatin astengkirin, 3 kes birîndar bûn ku yek ji wan zarok bû.

Rayedaran diyar kir ku birîndar birine tedawiyê û yekîneyên ewlehiyê û parastina sivîl prosedurên rewşa lezgîn xistine dewrê.



**Li Bahreynê cara sêyan alarm hate dayîn**

Wezareta Karên Hundir a Bahreynê ragihand ku di nava rojê de 3 caran sîrenên êrişa hewayî lêxistine.

**Urdun: Ji Îranê 3 fuze hatin avêtin**

Artêşa Urdunê ragihand ku 3 fuzeyên ji Îranê hatine avêtin, danê siharê ketine herêmên cuda yên welêt. Li gorî daneyên ewilî, di êrişan de windahiyên can çênebûne.

**Li Hurmuzê di keştiya êriş li ser pêkhatî de, welatiyên Hindî jî hebûn**

Wezareta Karên Derve ya Hindistanê ragihand ku di keştiya ku li Kendava Hurmuzê êriş li ser pêk hatî de, 11 welatiyên Hindistanê hebûn. 10 kes hatine rizgarkirin û kesek jî winda ye.

Artêşa Amerîkayê li nêzî Tengava Hurmuzê li pergalên parastinê û ferîbotên Îranê xist.

Malpera 'Axios' ku agahiyên xwe dispêre rayedarekî Amerîkayê diyar kir ku artêşa Amerîkayê li 2 nuqteyên nêzî Tengava Hurmuzê li pergalên parastina mûşek, asîmanî û ferîbotên bilez ên Artêşa Pasdarên Îranê daye.

Fermandariya Navendî ya Amerîkayê (CENTCOM) ragihand ku operasyon wek bersivek li ser êrişeke li dijî keştiyeke konteynerê ya sivîl a bi ala Qibrisê dema ku ji Tengava Hurmuzê derbas dibû, pêk hat. Wê êrişî hişt keştî bişewite, zirarek mezin bi odeya ajotinê bibe û endamekî ekîbê jiyana xwe ji dest bide.

Çapemeniya Îranê jî ragihand ku di navbera 10 û 11 mûşekan li girava Qeşim a Îranê ketin û parêzgarê girava Hisên Emîr Teymûrî jî got hemû armanc leşkerî bûn û tu birîndarî çênebûn.

**Ragêşiya dema dawî**

Amerîkayê ragihand ku ji bo parastina keştiyên bazirganiyê yên li Tengava Hurmuzê wan êrişên nû li dijî Îranê kirine. Îranê jî ragihand ku êriş biriye ser hedefên leşkerî yên li Urdun, Bahreyn, Kûweyt û Ûmmanê yên DYA'yê.

Fermandariya Hêzên Navendî ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (CENTCOM) ragihand ku bi dema Washingtonê saet di dawiya roja 12'ê Tîrmehê de li hemberî Îranê dest bi pêleke nû ya êrişan kir. CENTCOM'ê ragihand ku operasyon ji bo parastina trafîka deryayî ya bazirganiyê û keştiyên sivîl ên li Tengava Hurmuzê bû. Di daxuyaniyê de hate gotin, bi fermana Serokê DYA'yê Donald Trump ji bo "hesabpirsîna" ji hêzên Îranê operasyon hatiye kirin.

Li gorî medya dewletê ya Îranê di êrişên DYA'yê de li eyaleta Hurmuzganê xebatkarekî telekomunîkasyonê jiyana xwe ji dest da, 2 kes jî birîndar bûn. Li gorî ajansa IRNA'yê jî li bajarê Mahşehrê di êrişeke din de kesekî jiyana xwe ji dest da, çar kes jî birîndar bûn.

Hêza Pasedarên Îranê jî ragihandin ku weke bersiva li êrişên DYA'yê wan li baregehên Emerîkî yên li Bahreyn, Urdun û Kûweytê xistine. Muxafizên Şoreşê her wiha diyar kirin ku li sîstemên radarê yên li Ûmmanê xistine.

Artêşa Urdunê eşkere kir ku çar fuzeyên ji aliyê Îranê ve hatin avêtin ji aliyê sîstema parastina hewayî ve hatin astengkirin û tiştek bi kesî nehat.

Serokatiya Fermandariya Giştî ya Kûweytê jî ragihand ku wan sîstema parastina hewayî xistine dewrê.

Wezareta Karên Derve ya Îranê ragihand ku êrişên dawî yên DYA'yê hewldanên dîplomatîk ên mehên dawî bi temamî pûç kirine.

Wezaretê diyar kir ku Washingtonê mutabaqata beriya niha binpê kiriye û li Tengava Hurmuzê careke din atmosfereke nearam afirandiye.

Piştî nîvro careke din Artêşa Amerîkayê ragihand ku wan li saziyên ji bo çêkirina keştiyên jêravê û keştiyan li Îranê dane. Hate ragihadin ku di vê operasyonê de care yekem dronên deryayî bikar anîne.

Di 13'ê Tîrmehê de serokê Amerîkayê Donald Trump da zanîn ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) dê birêvebirina ewlehiyê ya Tengava Hurmuzê bigire ser xwe û got, "Washington dê tengavê kontrol bike."

# Şoreşa 19’ê Tîrmehê: 14 salên têkoşîn û berxwedanê (1)

Di 19’ê Tîrmeha 2012’an de çirûska yekemîn a şoreşê li Kobanê vêket û li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû bingeha qonaxeke nû. Di 14 salan de şoreş bi xweparastin, Rêveberiya Xweser, komîn û meclisan, ziman, çapemenî û berxwedana li dijî DAIŞ û dagirkeriyê pêş ket. Îro jî di nav pêvajoya peyman û entegrasyonê de, parastina destkeftiyên şoreşê mijarên herî girîng in .

**Amara Baran**

Di 19’ê Tîrmeha 2012’an de çirûska yekemîn a şoreşê ji bajarê Kobanê dest pêkir. Pêlên şoreşê li tevahiya bajarên Rojava belav bû. Şoreşa Rojava, bi pergala xwe ya “Neteweya Demokratîk” ku tevahiya pêkhateyan hembêz dike, li seranserî cîhanê bû model. Emê di dosyaya xwe de, ji destpêka şoreşê heta niha çi çêbû, dosyayek ji sê beşan parve bikin.



### Ji “Bihara Ereban” heta rabûna gelan li Sûriyê

Di sala 2011’an de yekemîn pêla şoreşê li Tûnisê dest pê kir û di demeke kurt de berbelavî gelek welatan bû. Misir, Lîbya, Yemen, Sûdan, Iraq û gelek welatên din jî bûn qada xwepêşandanên girseyî. Ji ber ku piraniya van xwepêşandanan li welatên Erebî pêk hatin, ev pêvajo di cîhanê de bi navê “Bihara Ereban” hate naskirin. Di 15’ê Adara 2011’an de ev pêla serhildanan gihîşt Sûriyeyê. Li bajarê Deraa, piştî girtin û işkencekirina komek zarokan ku sloganên dijî rejîmê li ser dîwaran nivîsandibûn, xwepêşandan dest pê kir. Bersiva tund a hêzên ewlehiyê ya li dijî xwepêşanderan bû sedema xwepêşandanên mezintir û firehbûna wê li gelek bajar û herêmên Sûriyê. Di demeke kurt de Deraa, Hums, Hema, Şam, Heleb û bajarên din bûn navendên xwepêşandanên girseyî. Di van xwepêşandanan de sloganê ku herî zêde dihat bilindkirin ev bû: “Gel dixwaze rejîmê biguhere.” Ev slogan bû nîşana daxwaza gel ji bo bidawîkirina desthilatdariya dîktatoriya Beşar Esad û destpêkirina pêvajoyek nû ya siyasî ku li ser bingeha azadî, demokrasî û mafên mirovan ava bibe.

### Ji YXG’ê heta YPG’ê pergala xweparastinê ya Şoreşa rojava

Di destpêka aloziyên Sûriyê, di sala 2011’an de, li herêmên Kurdan pêwîstiya gel bi parastineke xurt hebû. Di nav şert û mercên aloz de Yekîneyên Xweparastina Gel (YXG) hatin damezrandin da ku gel xwe li hemberê êrîşan biparêze û ewlekariya xwe bi xwe bigre. YXG’ê ji komeke dilxwazan pêkhat û tevahiya civakê xwedî li wî hêzê derket. Di şoreşa 19’ê Tîrmehê de jî YXG’ê di parastina bajarên Rojava de bûn xwedan rol.

Di 20’ê Tîrmeha 2012’an de YXG ê bi awayek fermî bi navê YPG’ê xwe îlan kir. Piştî damezrandina YPG, hêz bi lez mezin bû û di parastina Kobanê, Efrîn û Cizîrê de rolek bingehîn lîst. Di sala 2013’an de jî Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) wek hêzeke serbixwe ya jinan hate damezrandin û bi vê yekê pergala xweparastinê ya Rojava bêtir rêxistî û fireh bû.

### Kobanê: Çirûska şoreşa 19’ê Tîrmehê

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ku bi salan di bin siyaseta înkar, îmha û bindestiyê de dijiyan, bi destpêka Şoreşa 19’ê Tîrmeha 2012’an re careke din bi hebûna xwe, îradeya xwe û mafê xwe yê birêvebirinê nîşan dan. Ev şoreş li ser bingeha felsefeya Netewa Demokratîk ava bû, felsefeya yek ziman, yek reng qebûl nekir, li şuna wi netewa demokratîk pirrengiya gelan esas girt. Pêlên Şoreşa 19’ê Tîrmehê li Kobanê dest pêkir û li tevahiya heremên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê belav bû. Wê demê gel şaxên ewlehiyê yên Baasê neçar kirin ku radest bibin û ji bajêr derkevin. Di heman deme de gelek navendên ku girêdayê Baasê bûn hatin rizgarkirin, avahiyên ku hatin rizgarkirin jî bûn navendên xwerêveberin û perwerdehiya gel.

### 2013’an de Serê Kaniyê bû hedefa êrişên El-Nusra

Di 17’ê Tîrmeha 2013’an de, salek piştî Şoreşa 19’ê Tîrmehê, komên çekdar ên girêdayî Cebhet El-Nusra, bi piştgiriya Ehrar El-Şam û hin komên din ên dijber, êrîşek fireh li dijî Serêkaniyê dest pê kirin. Armanca wan dagirkirina herêmên stratejîk û têkbirina destkeftiyên ku piştî şoreşê li herêmê hatibûn bidestxistin bû. Di encama şer de gelek malbat neçar man koçber bibin, her wiha gelek binesazî û cihên sivîl di êrişan de zirar ditin. Piştî çend rojan ji şerên dijwar, hêzên YPG û YPJ gelek cih ji komên El-Nusra paqij kirin û pêşveçûna wan rawestand. Berxwedana şervanên YPG û YPJ li Serêkaniyê bû yek ji berxwedanên ku di qonaxa destpêkê ya Şoreşa Rojava de bandorek mezin li ser heremê da çêkirin.

### Kobanê bû kelha berxwedanê

Kobanê, ku bû dergûşa Şoreşa 19’ê Tîrmehê, di sala 2014’an de , di şerê li hemberê çeteyên DAIŞ’ê de bû sembola berxwedanê. Di Îlona 2014’an de çeteyên DAIŞ’ê, bi piştgiriya Dewleta Tirk, êrişeke berfireh li ser Kobanê dan destpêkirin. Erdogan jî di çapemeniya xwe de digot “Kobanê ket ha ket”. Li hemberî wan êrişên hovane û li ser bangawaziya Rêber Apo seferberiyeke mezin hat ragihandin. Bi sedan keç û xortên Kurd berê xwe dan Kobanê, bi riheke fedaiyane şer kirin. Berxwedana Kobanê tenê parastina bajarekê nebû, ew bû parastina nirxên azadî, yekîtî û demokrasiyê. Di encamê de, çeteyên DAIŞ’ê cara yekemîn têk çûn. Û Kobanê bû sembola şoreşa 19’ê Tîrmehê.

### Rêxistina Civaka Demokratîk TEV-DEM

Di şert û mercên aloz yên ku herem têde derbas dibû, gel bi siyaseta înkar û qedexekirinê re, rû bi rû mabû. Di 20’ê Kanûna 2011’an de Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) hate damezrandin. Damezrandina TEV-DEM’ê wekî bersivek li hember qeyrana siyasî ya li heremê û daxwaziya gelan ji bo pergala nû ya rêveberiyê hate dîtin. Armanca sereke ya TEV-DEM’ê avakirina civakeke demokratîk bû ku li ser bingeha felsefeya Netewa Demokratîk, xwerêveberina civakê û ji bo yekîtiya gelan xizmetê bike. TEV-DEM’ê bi damezrandina xwe re dest bi rêxistinkirina civakê kir. Li gelek bajar û gundan komîn rêxistin kirin û meclis ava kirin, saziyên ku ji aliyê TEV-DEM’ê de hatin avakirin, ji pirsgirêkên gel re bûn bersiv. Di destpêka Şoreşa 19’ê Tîrmeha 2012’an de, rola TEV-DEMê bêtir berfireh bû. Di rêxistinkirina saziyên Rêveberiya Xweser de bû hêza bingehîn. Di Kanûna 2014’an de, dema ku Rêveberiya Xweser li kantonên Cizîrê, Kobanê û Efrînê hatin ragihandin, gelek saziyên ku berê ji aliyê TEV-DEMê ve hatibûn rêxistinkirin, bûn bingeha pergala nû ya van xebatan.

### Di nav alozî û şer de îlankirina Rêveberiya Xweser

Piştê têkçûyina çeteyên DAIŞ’ê, Şoreş tene di Kobanê de asê nema. Di nav êrîşan de Rêveberiya Xweser hat îlankirin. Ji Kobanê ber bi Efrînê û Cizîrê, piştre jî ber bi Reqa, Tepqa, Dêra Zor û heta taxên Eşrefiyê û Şexmeqsûd yên Helebê ve çû, li gelek deveran jî xwepêşandanên gel çêbûn û daxwaziya rêveberiyeke xweser ku mînaka wê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, kirin. Avakirina pergala Rêveberiya Xweser a Demokratîk ku xwe dispêre felsefeya Rêber Apo, ji bo Kurdan û tevahiya gelê heremê bû cihê kêfxweşî û dilgeşiyê. Ji ber ku cara yekem bû ku gel dikarî xwe bi xwe rêve bibe û bi awayek rihet di hemû qadan de tevbigere. Kanûna 2014’an bû qonaxeke dîrokî di Şoreşa Rojava û tevahî herêmê de.

Rojavayê Kurdistanê Rêveberiyên Xweser li 3 kantonan; Cizîr, Kobanê û Efrînê hat ragihandin. Her rêveberiyekê sazûmaniya xwe li gorî sîstemên rêveber ên cîhanê (rêveberî, qanûnsazî û dadgerî) hilbijart û saziyên xwe yên xizmetguzarî, çandî, ewlehî, perwerde, sivîl, rêveberî û civakî, vekirin. Piştî ku pergala Rêveberiya Xweser hat damezirandin, Hevpeymana Civakî hat amadekirin. Di hevpeymanê de zimanên Kurdî, Erebî û Suryanî wek zimanên fermî hatin qebûlkirin û rê li pêşiya pêkhateyên din hat vekirin ku zimanê xwe fêr bibin. Li gorî hevpeymanê, rêjeya temsîliyeta jinan di saziyan de herî kêm ji sedî 50 hat diyarkirin û hat gotin ku divê pêkhateyên cûda yên herêmê di pergala Rêveberiya Xweser de cih bigirin...



**Farûk Sakik**

## Aştî çandeke…

Ji Cotmeha 2024’an û vir ve, di navbera Tirkiyê û Kurdan de ‘pêvajoya aştî û çareseriyê’ careke din dest pê kiriye.
Piştî axaftinên Meclisê yên Bahçelî, banga Rêber Ocalan a ji bo PKK’ê ya dawî anîna şerê çekdarî û fesixkirina rêxistinê, di dîrokê de qonaxeke bêhempa bû.
Aştî, şernekirinê îfade bike jî, aliyek wê kêm dimîne. Dema ku pevçûn bi dawî dibin, çek bêdeng dibin, kolan di nav bêdengiyê de dimînin, ji vê serdemê re “aştî” tê gotin.
Lê belê aştî ne tenê bêdengî ye; di heman demê de fêmkirin û bide fahmkirine jî.
Bersivdayîna PKK’ê ji vê bangawêziyê re û fesixkirina xwe, nîşan dide ku serdemek diqede.
Lê belê ji bo ku aştî bi wateya rastîn dest pê bike, ne tenê bêdengiya çiyan, lê di heman demê de guhertina zimanê destûra bingehîn, guhertina zihniyeta dewletê, guhertina gotinên provokatîf ên çapemeniyê, guhertina nêrîna serbilind a burokrasiyê (burokrasiya çekdar û sivîl) û pratîkên wan jî pêwîst e! Tevî van hemûyan û her çiqas hêdî hêdî dimeşe jî, nayê înkarkirin ku em ketine nav pêvajoyekê.
Di 11’ê Tîrmaha 2025’an de, dema ku çek hatin şewitandin ev yek hat hedefkirin.
Bêdengî, nizama serdest e, lê aştî hewldana wekhev beşdarbûna di avakirina nizama hevbeş de û hewldana avakirina wê ye. Bi kurtasî herdun alî berpirsyariyek xwe hene.
Ji bo vê yeke aliye tevgera azadiyê gelek hewlda û carcarna jî fedekarî kir. Ji bo aştiyek mayinde tavîz jî da. Peyva “teröre” ku bi kardanîn, aliye Kurdan rencide dikir, lê dîsa jî ji bo aştî mayin bibe Kurd ‘es’ derbasdibûn.
Pirsgirêka Kurdî ya li Tirkiyê ya ku zêdetirî sed salî ye, ne tenê pirsgirêka “şerê li dijî terorê” ye; ew travmayeke siyasî ye.
Tenê bi perspektîfa ewlehiyê ve mijûlkirina vê travmayê, tenê tengkirina meseleyê ye; ew têr fêmnekirin e, pirsgirêkê bi awayekî çewt pênasekirin e.
Ji ber ku ev pirsgirêk ne tenê di çekên li çiyayan de, ne tenê di bombeyên li bajaran de ye; ew di destûra bingehîn de, di bernameya dibistanan de, di navên bajaran de, di salonên dadgehê de, di nasnameyên nifûsê de, di qedexekirina ziman de û di bîra kolektîf de tê jiyîn û hîna jî berdewam dike.
Dive ku dewlet li hember van hesasiyetan şîyar be. Qanûnek poşmaniyê ji bo Kurdan qanûna rencide kirinêye.
Raste ji roja çek şewitandinê hetanî roja me diviya gelek gav bahatina avêtin. Lê mixabin.
Baş e, em ê çi bikin? Ji bo ku gotûbêjên heyî û lêgerîna ‘çareseriyê’ bigihêje aştîya erênî û çareseriya rastîn.
Em wekî Kurd û Tirk, wekî kesên li vê erdnîgariyê dijîn; nivîskar, ronakbîr, entelektuel, jinên ku wekî wijdana civakê tên binavkirin, di vê mijarê de dikarin çi rolê bilîzin?
Divê were zanîn ku bidawîanîna vê pêvajoya pevçûnê ya ku zêdetirî sed salî ye, ku hemû enerjiya me, hemû çavkaniyên me, deh hezaran canên me standiye. Hatina aştîyê bo erdnîgariya me, ne tenê ji bo Kurdan û ne jî tenê ji bo dewletê tê hiştin.
Ji ber ku pirsgirêk û çareseriya ku dixwazin pêş bixin, ne pirsgirêka tenê aliyên şerker e, pirsgirêka me hemûyan e û çareseriya pirsgirêkê jî divê me hemûyan di nav de bigire. Ev ne tenê wezîfe ye; di heman demê de ceribandineke civakî ye. Ya ku li vir herî zêde bala xwe dikişîne, ew e ku em ê çiqas hewl bidin ji bo vê ceribandinê.
Heralî û herkes xemsare. An jî bêhêvîne. Bi tene Rêber Apo, bi hêvî û bi bawerî ji Îmralî midaxeleyî hewesa şerxwaza dike.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî



**Can Yûsiv**

Hunermend Erdewan Zaxoyî; Dengê azadî û azara Kurdî.
Hunermendên Kurd yên pabenîdar di wê demê de ku tê de peyv qedexe bû, stran qedexe bû û ziman di nivîsandin û axaftinê de hatibû dorpêçkirin û di bin siya zext û zordariyê de, huner veguherandin kiryarekî berxwedana çandî û amûrek ji bo parastina bîrdanka civakî.
Hunermend Erdewan Zaxoyî yek ji wan kesan tê hesibandin ku zimanê kurdî di dengên xwe de hilgirtin û stran kirin peyamekî girêdan û pêdariyê,bi vî awayî wan rolek girîng lîstin ku mîrata stranbêjiya Kurdî zindî bimîne , û di nav nifşan de were veguhestin, tevî hemû qedexe û metirsiyan.
Hunermend, awazdêner û stranbêjê kurd Erdewan Zaxoyî di 1/7/1957’an de li bajarê Zaxo, ji dayîk û bavek kurd, di nav malbateke hejar a neteweyî ya kurdperwer, hezkiriyên huner û muzîkê de, ku ji heşt kur û sê keçan pêk tê, hatiye dinya yê,
ku li ser nirxên resen ên kurdayetiyê, dilsoziya ji bo welat û wefadariya ji bo nasnameya neteweyî mezin bûne.
Dibistana seretayî li bajarê Zaxo qedandiye, lê nikarî xwendina xwe bidomîne ji ber şertên jiyanê yên dijwar ku malbata wî tê de derbas dibû.
Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ya ji bo stran û muzîka kurdî di temenekî biçûk de dest pê kir, dema ku xwendekarê dibistana seretayî bû, di konserên dibistanê de stran digotin û ji stranên folklorîk û kevneşopî yên kurdî pir hez dikir, ew ketbû di bin bandora jîngeha hunerî ya derdora xwe û hunermend û dengbêjên mezin ên Kurd de, ji ber ku bajarê Zaxo wê demê navenda huner û mûzîka Kurdî û penageha hunermendên Kurd ên ji çar parçeyên Kurdistanê bû.
Destpêka rêwîtiya wî ya hunerî wekî efserê rîtmê bi hunermend Sebah Zaxoyî re bû, demek ne dirêj wî dest bi stranbêjiyê kir , awazî “teqlîda” şêwazê hunermendên mezin ên Kurd, wek Semîr Zaxoyî, Tehsîn Taha, Aram Tîkran dikir , ku bandoreke wan ya berçav di avakirina kariyera wî ya hunerî de hebû, û bi saya dengê xwe yê xweş û germ , milyonan kes matmayî dikir û ew bû yek ji dengên kurdî ên bi bandor di bîranîna stranbêjiya kurdî de.
Di sala 1977’an de ligel çend dengbêjan beşdarî damezrandina koma muzîkê ya bi navê “Koma Ciwanên Zaxo ya Hunerî ” dibe û di wê demê de çend stranên folklorî û kevneşopî tomar dikin.
Piştî ku di herêma xwe de navdar dibe û dengê wî belav dibe, di heman salê de bi Semîr Zaxoyî û Nezîr Remezan re diçe Radyoya Bagdadê – beşa kurdî, û piştî serkeftina wî li pêşberî komîteya hilbijartina dengan li êzgehê ,ew wek dengbêj hate pejirandin û pênc stranên xwe yên nû li wir tomar dike.
Piştî wê stêrka wî li seranserê Kurdistanê şewq da û di koma Newrozê de li kêleka Tehsîn Taha, Beşar Zaxoyî û Semîr Zaxoyî stranan dibêje.
Di sala 1978’an de, wî yekem albûma xwe ya stranbêjiyê tomar kir bi navê «Dûrît Zaxo Rê Dixweyên», bi hevkarîya hunermend Sibah Zaxoyî. Ev albûm ji awazên Nezîr Remezan û gotinên Xalis Xelîl hatbû amade kirin. Ev albûm gelek belav bû û hunermend Erdewan bi wê navdar bû, taybetî li herêma Bahdinan , di wê demë de, ew ji alîyê hin hunermendên mezin ên kurd ve hate piştgirîkirin û teşwîqkirin, mîna Mihemed Arif Cizrawî, Gulbahar, Tehsîn Taha û yên din.
Di sala 1980’an de, hunermend Erdewan Zaxoyî bi keçek kurd re bi navê Lêyla di zewice, û ji wane du zarok çêdibin: kurek bi navê Kovan û keçek bi navê Hozan ,ew niha li welatê Swêdê dijîn.
Di sala 1980’an de, dema ku şerê Îraq û Îranê dest pê kir, ew ji bo xizmeta leşkerî hate vexwendin . Piştî tevlêbûna xwe, nikarî wê rewşê ragire, ji ber wê yekê reviya û çû Tirkiyê, û li bajarê Cizîra Botan bi cih bû, û di wê heyamê de sê albûmên stranbêjiyê tomar kir.
Di sala 1982ê de vedigere Zaxo û li wir ji aliyê rayedarên iraqî ve tê girtin, tê binçavkirin û avêtin zindana Kerkûkê, piştî derxistina biryara lêborîna giştî, ew hate berdan, ji ber hezkirina wî ya kûr ji Kurdistanê re û baweriya wî ya xurt bi doza gelê wî yê sitemar re, û amadebûna wî ji bo fedekarî û qurbanîdanê di rêya wê de , ew tevlî refên pêşmergeyan dibe, û li kêleka hilgirtina çekan, li wir stranên xwe berdewam dike û rolek girîng dilîze di êzgeha neteweyî ya kurdî de, bi riya radyoya «Dengê Kurdistanê – Dengê Şoreşa Başûrê Kurdistanê».
Li wir, di sala 1983’an de tevlî koma “Gulan a Hunerî” dibe û gelek stranên neteweyî, sirûdên şoreşgerî û lavijên xemginî pêşkêş dike, ji wan strana “Dayê Îro Ez Pêşmerge Me”, sitrana “Kurdistan Kurdistan Barê Giran Kurdistan ” û hwd.
Nemir Erdewan Zaxoyî bi gelek zimanan dizanîbû ,di nav wan de zimanê Erebî û Farisî ,ji bilî zimanê xwe yê dayîkê yê kurdî , ew xwediyê xezîneyeke mezin a stranên folklorî, şoreşgerî û neteweyî yên kurdî bû, wî bi xwe jî gelek stran çêkirine.
Di heyama rêwîtiya xwe ya hunerî ya kurt de, di navbera salên 1970 û 1986’an de, zêdetir ji 200 stranên curbicur tomar kirine, ku piraniya wan folklorî, şoreşgerî û neteweyî bûn, û herwiha li ser bedewiya xwezaya Kurdistanê jî hebûn,di nav wan de stranên wek «Zaxo şox û şêrîn e, bijî pêşmerge», «Dil hilê ser», «Kurdistan ew welat » û «Hatın hatın» û yên din hebûn.
Piraniya stranên wî ji helbest û gotinên helbestvanên kurd ên, wek Cegerxwîn, Sabrî Botanî, Salih Yûsif, Bedirxan Sendî, Xalis Xelîl, şehîd Mahmud Halo, Hikmet Agrî û yên din ve hatine nivîsandin, wî ji van çavkanîyên edebî gotinên bedew wergirtine û bi awazên xwe yên xweş xemilandine , bi hevkarîya bestekarên navdar ên wek Semîr Zaxoyî, Sibah Zaxoyî, Ebdulazîz Sûleyman, Yûsif Ramadan, Emad Agirî, Ferhad Bazî û hinên din.
Hunermend Erdewan Zaxoyî hevdemê gelek stêrkên hunera Kurdî bû û bi wan re ezmûna stranbêjiya duetan (stranên hevpar) derbas kir, wek: Mihemed Arif Cizrawî, Hesen Cizrawî, Tehsîn Taha, Ebdo Elanê, Şakir Aqrêyî, Seîd Gebarî, Mihemed Teyîb Tahir, Gulbahar, Semîr Zaxoyî, Bişar Zaxoyî, û rêhevalê wî Ayaz Yûsif.
Çalakî û hinêra wî ya hunerî tenê bi dengbêjiyê sînordar nebû, wî tekstên gelek stranên xwe nivîsandin û awaz ji wan re çêkirin, bi taybetî yên rengên netewî û folklorî, stranên herî navdar ji gotin û awazên wî:

1- Kurdistan Barê Giran.
2- Dayê Evro Ez Pêşmerge Me.
3- Gula Baxan Kurdistan.
4- Newroz Hat Eve.
5- Her Bimîne Welatê Kurd.
6- Zaxo Şox û Şêrîne.
7- Denge seyrana xweş tê.
8- Kurdistan Ey Welat
9- Bilbilo.
10- Hey Li Min.

Hunermendê nemir Erdewan Zaxoyî, ji awazên xwe û awazên bestekarên din, gelek stranên welatparêzî û hestyarî pêşkêş kirin, ku pirtûkxaneya hunerî ya Kurdî dewlemend kir, wî jii bo welat, ji bo êş û hêviyê, ji bo Pêşmerge û şoreşgeran û ji bo azadî û rûmetê stran gotin û stranên folklorîk û kevneşopî ji pişavtin û jibîrkirinê parastin.
Di nav stranên herî navdar ên ku bi dengê wî yê zelal hatine gotin :



1- Babo.
2- Pêşmerge.
3- Dada Dil Tejî Kovane.
4- Kurdistana Delal.
5- Ez Dizanim.
6- Birîndarim Ji Bo Welat .
7- Kurdistan Hey Kurdistan
8- Ji Min Revandin.
9- Dada Ezê Di Cengim .
10- Zerya Min.

Di nîvê salên heştêyî de nemir Erdewan Zaxoyî ligel pêşmergeyan berê xwe da rojhilatê Kurdistanê û li wir ji aliyê zordarên Îranê ve hat girtin û çend mehan di zindanê de ma, piştî azadbûna xwe çû Bakurê Kurdistanê û li bajarê Cizîra Botanê bi cih bû û biryar da ku koçî Ewropayê bike, lê ji ber ku pasporta Îraqî tune bû, neçar ma di sala 1985’an de vegere Zaxo ji bo wergirtina pasaportê.
Di dema vegera xwe de, ew rastî mirina hevalê xwe Eyaz Zaxoyî hat, û li ser gora wî stran gotin, di wê heyamê de, ew ji aliyê îstixbarata rejîma Sadam ve hate girtin û rastî şikence û lêdanê hat, ji ber ku di ber efûya giştî ket ew hate berdan.
Di 28 Çileya 1986’an de, ew hat vexwendin ku here Bexdayê û stranên xwe bi helkefta çil û heftemîn ya salvegera damezrandina Radyoya Bexdayê - beşa kurdî, pêşkêş bike, ew di ahengê de amede bû, tevî çavdêriya tund a îstixbarata Baasê, wî stranên welatparêzî û şoreşgerî pêşkêş kirin.

Piştî bidawîbûna konserê û vegera wî bo otêla «Agadîrê » ya ku lê dima, bi sûcdariya ku dijminatiya dewletê dike ji aliyê hevalbendên rejîma Sadam ve hate revandin û ji ber helwestên xwe yên neteweyî û siyasî rastî êşkence hat, û heta îro jî ti şop ji wî nehat dîtin.
Çîroka winda bûna wî yek ji bûyerên herî xemgîn û nezelal di dîroka hunera kurdî de dimîne, çimkî malbata wî zêdetirî 15 salan li wî geriyan bêyî ku ti nîşanek ji wî bibînin. Hêj jî cihê wî ne diyar e, û hin dibêjin ku ew di 29’ê Çileya 1986’an de di bin êşkenceyê de şehîd bûye.
Erdewan Zaxoyî yek ji wan dengên Kurd e ku şopeke kûr a hunerî û neteweyî li dû xwe hişt, tevî jiyaneke kurt û trajîk, bû dengê azadî û azara gelê Kurd.
Bi çûyîna wî re neteweya kurd yek ji stûnên strana kurdî û hunera kurdî a resen winda kir , hunera ku hevahengî dikir di navbera mîrata gelêrî û naverokên siyasî û neteweyî de, ew dengek bû ku derbirîna wijdan kurda dikir û îro jî wek yek ji sembolên hunera kurdî tê bibîranîn.
Berhemên wî bi stranên hezkirina welat, vejandina folklora kurdî, û berevaniya doza azadî û dadweriyê diyar bûn, ew bûn sedema ku ew bibe dengekî bibandor di wijdanê ciwan û hezkiriyên hunera Kurdî de û zindî bimîne di bîra çandî de tevî ne amedebûna wî.
Tevî jiyana xwe ya kurt û xemgîn, wî mîraseke afirîner û dewlemend a stranbêjiyê û sirûdên neteweyî û şoreşgerî yên bi coş li dû xwe hiştin ,ku rê ronî dike li pêşiya nifşên paşerojê .
Hunermend Erdewan Zaxoyî bi laşê xwe çû, lê nav û hunera wî dê di wijdan û bîra gelê kurd de zindî bimînin û stranên wî dê her tim nifşek pey nifşekî bibêjêt , her çend dem derbas bibe jî.
Di encama helwêstên wî yên welatparêzî, xebatên wî hunerî û afirîneriya wî ya dilsozane de, peykerê wî li meydaneka bajarê Zaxo hate danîn, da ku bibe nîşana pêzanîn û dilsoziya bi rêwîtiyeke ku huner û têkoşînê bi hev ve girêdide, û hebûna wî bibe sembolek jîndar di bîranîna wê deverê de, û nîşaneyên zindî di wijdana xelkê bajêr û nifşên bên re.
Ji giyanê wî yê pak re rûmet mandarî û ji mîrateya wî ya têkoşînî , şoreşgerî û hunerî re mayînde û domdarî.

# Meclisa Hilêliyê: Wê pirsgirêka çopê çareser bibe

Şêniyên taxa Hilêliyê gazinên xwe ji ber kombûna çopê anîn ziman, di heman demê de Meclisa Taxa Hilêliyê ku bûye berpirsyara barkirina çopa taxê tekez kir ku dê ev pirsgirêk di demek nêz de çareser bibe û bernameyek taybet ji bo paqijiya taxê bê danîn.


Fehed Memo


Sumeya Mihemed


Mihêdîn Hisên


Remedan Derwîş

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Pirsgirêka kombûna çopê herwiha paqijiya di nava kolan û taxan de yên herî aloz e di hemû bajarên herêma Cizîrê de, nemaze li bajarê Qamişlo. Şaredariya gel hewildanên xwe ji bo çareseriya vê pirgisrêkê dike û bi hemû awayan dixebite, lê belê zehmetî gelek in ji ber ku bajar mezin e. Meclisa Taxa Hilêliyê însyatîfeke destpêkirin û wekî alîkarî di warê paqijiyê de bi şaredariyê re, barê paqijiya taxê hilgirt ser xwe. Lê belê ji ber kombûyîna çopên berê, gelek zehmetî û astengî derdikevin. Şêniyên taxa Hilêliya jêr ên komîna Şehîd Sebirî gazinên xwe derbarê derengmayîna gerîna terektorên barkirina çopê anîn ziman. Me jî rojnameya Ronahî gazinên gel gihand meclisê û meclisê soz da ku di demeke nêz de wê tekez ev pirsgirêk bê çaresrkirin.

**'Dîmen û çopa komkirî zirareke mezin dighîne bajêr'**

Şêniyên bi navê Fehed Memo ku ji taxa Hilêliya jêr e, diyar kirk u hin caran 10 rojan çop li erdê komkirî dimîne û wiha got: "Ji ber dernghatina terektorê em neçar dimînin ku çopê bavêjin çolê an jî em dibin bazara Hetînê ji bo bixin kontereyên çopê, li wê derê jî li derora konteryan hemû çop avêtî ne û hilma nexweş jê belav dibe. Ev dîmen û çopa komkirî zirareke mezin dighîne bajêr û tenduristiya welatiyan dixe metirsiyê, eger di demên pêş de çareseriyeke neyê dîtin wê nexweşiyan bi xwe re bîne."
Fehed Memo daxwaz kir ku terektorên çopê bi awayekî rojane dakeve nava taxê û çopê bar bike û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Hêviyên me ew e ku şaredariya me û her aliyên ku li ser paqijiyê disekinin ku erkên xwe bi cih bînin."
Fehemd Mamo di dawiya gotinên xwe de destnîşan kir ku yek ji sedemên nepaqijbûna kolanan, neziftkirina kolanan e, ev yek dihêle pir gemar, toz û ax xwe li kolana bigre, ev yek dihêle dîmenê wê nexweşik be û gemar li ser erdê û li kolanê kom bibe.

**'Ji ber kêmbûna rêxistina di aliyê paqijiyê de pirsgirêka çopê derdikeve'**

Welatiya bi navê Sumeya Mihemed ku ew jî ji taxa Hilêliya jêr e gazinên xwe derbarê warê paqijiyê anî ziman û wiha got: "Carnan terektora çopê li ser hev tê û carnan jî bi rojan nagere ku dighêje sê an çar rojan. Ev dibe sedema kombûna çopê û derketina hilmên nexweş herwiha belavbûna mêşan û li ber deriyan belav dibe. Em gelekî êşê di warê paqijiyê de dibînin."
Sumeya Mihemd destnîşan kir ku ji ber kêmbûna rêxistina di aliyê paqijiyê de ev pirsgirêk derdikevin herwiha tekez kir ku dema kolanên wan zift bin wê ewqas çop çênebibaya û wiha anî ziman: "Dema ku mirov bixwaze ji pirsgirêka çopê bi giştî xilas bibe divê di destpêkê de tax werin ziftkirin heta ku paqijî hêsan bibe. Ji ber ku sedema sereke ew e ku toz û gemar xwe li erdê digrin. Em dixwazin ku kolanên me jî bêne ziftkirin, ji ber ku wê bi vê yekê hinekî çop û gemar kêm bibaya, sedema sereke ya kombûna gemaran jî neziftkirina kolanan e. Em çiqasî li pêşiya mala xwe paqij bikin ji ax û tozê, dîsa weke xwe dimîne."

**'Me gelek caran daxwazên xwe gihandine şaredariyê lê bersiv tune ye'**

Berpisyarê beşa xizmetguzariyê ya komîna Şehîd Sebirî Mihêdîn Hisên tekez kir ku ev e çar sal in wan di raporên xwe de daxwaza ziftkirina kolanên taxa Hilêliyê kiriye, da ku bi vê yekê hinekî pirsgirêka çopê kêm bibe û wiha got: "Dema ku kolanên me ziftkirî bin hilbet wê paqij bimîne, hemû kolan hatine hilwişandin, ji ber ku erebeyên barkirinê yên xazê hatine hilwişandin û xirabûne.Terektora barkirinê jî her çend rojan tê."
Mihêdîn Hisên wiha li gotinên xwe zêde kir: "Li gel piresgirêka paqijiyê ku em astengiyan ji ber dikşînin, taxa Hilêliyê gelek zehmetiyên din yên xizmetguzariyê dibîne, wekî pirsgirêka kanalîzasyonan, pirsgirêka wê ew e ku boriyên wê hatine şikestin û nayên paqijkirin, herwiha ava wê her tim li malan vedigere, pêwistiya wê bi guhertinê heye, ev e sê sal in em daxwaza vê yekê dikin, lê heya niha tu bersiv tune ye."

**'Di demek pêş de wê pirsgirêka çopê were çareserkirin'**

Ji hêla xwe ve endamê komîna şehîd Şevger a meclisa Hiêliyê Remedan Derwîş ji me re sedema komkirina çopê û derengmayîna gerîna terektoran anî ziman û wiha got: "Ji destpêkê ve pirsgirêka kombûna çopê hebû, ji ber vê yekê em weke meclisa Hilêliyê xebatek me da meşandin, wekî alîkarî hem bi şaredariyê re hem jî bi milet re, gazinên milet ji ber kombûna çopî rast e. Ji 24'ê Hizêranê ji nûve me dest bi xebatên paqijiyê kir, li ser esasê ku 4 terektorên barkirina çopê alîkariya me bike di mile paqijiyê de, lê mixabin du terektorên me xirabûn, ev yek bû astengî di derengmayîna barkirina çopê."
Remedan Derwîş destnîşan kir ku berî terektor xirab bibin hewil dan ku kombûna çopê ya çêbibû hinekî sivik bikin û wiha got: "Ji bo ku wekî vê carê barkirina çopê dereng nemîne me daxwaza terektoreke din ji şaredariyê kir, niha tenê sê terektor di xizmetê de ne û du xirabûne. Di demek nêz de dê mijara kombûna çopê bê çareserkirin, lê divê gelê me jî hinekî bi sebir be. Heya ji me bê em ê li ser vê pirsgirêkê bisekinin."

**Sîstema barkirina çopê**

Li ser sîstema gerandina çopê Remedan Derwîş diyar kir ku wê êdî rojekê terketor bigere û rojekê na, an jî her du rojan wê li kolanan bigere û wiha got: "Armanca me ya serek niha ku em kombûna berê ya çopê xilas bikin da ku em bernameyekê taybet çêbikin. Çar tax girêdayî meclisa Hilêliyê ne, du komîn li jêr û du li bane, tenê çar terektor ji me re hatine diyar kirin. Wê her roj terketoreke bi navê ajokar û xebatkaran li ser komînan bê belav kirin, da ku erdnîgariya xwe nas bikin û eger kêmasî derkevin wê hesba ji wan bê xwestin."
Endamê komîna şehîd Şevger a meclisa Hiêliyê Remedan Derwîş wiha gotina xwe qedand: " Em daxwaz ji miletê xwe dikin ku her kes di warê paqijiyê de baldar be, ev mijar ne tenê ji aliyek mîna şaredarî an jî em wekî meclis tê xwestin, seatên gerîna terektora çopê û derxistina wê bêne diyar kirin, divê milet di van deman de derxînin, raste di havînî de da ku bêhna çopê di hundirê malan de nemîne her kes çopê deridxe derve, lê divê dema ku terktora çopê bigre ji nû ve derxînin, ji ber ku lawirên wekî koçikan li çopê digerin û belav dikin, di encamê de hawîrdorê gemar dibe û dibe astemgî li hember xebatkarên barkirina çopê. Herwiha em hivîn e ku milet bi xebatkarên paiqjiyê alîkar bin û her kes xwe berpirsyar bîne çi di malên xwe de an di taxa xwe de."

# Bandora guhertina demsalan li ser tevgera kêzikan

**Navenda Nûçeyan**

**Mamosteyê Beşa Çandiniyê li Zanîngeha Rojava, Xêredîn Mûsa diyar kir ku her demsalek atmosfêreke taybet diafirîne û ev yek dihêle ku hin cureyên kêzikan derkevin holê. Di nav wan de, hin kêzik ji bo mirovan û xwezayê bikêrhatî ne, hin din jî zirareke mezin bi xwe re tînin.**

Guhertina werz û demsalan, ne tenê bandorê li keşûhewayê dike, lê belê weke qanûneke xwezayî, guhertinên mezin di jiyan û tevgera cûreyên cûda yên kêzikan de jî çêdike. Li gorî pisporan, çalakiyên kêzikan rasterast bi germahiya hewayê ve girêdayî ne. Hin cureyên kêzikan hewaya germ daxwaz dikin û di bihar û havînê de herî zêde belav dibin; hineke din jî di werzên sar de li stargeh û germahiyê digerin.

**Kêzikên Biharê**

Bi hatina werzê biharê re, gava germahiya hewayê digihîje derdora 15 heya 20 pileyan, kêzik ji xewa xwe ya dirêj a zivistanê şiyar dibin û ji bo dîtina av û xwarinê dest bi gerê dikin. Ev demsal, di heman demê de ji bo gelek cureyan dibe dema cotbûn û zêdebûnê.
Kêzikên herî berbiçav ên vê demsalê ev in:
Mêşa Hingiv: Ev kêzika xebatkar ku di parastina hevsengiya xwezayê de xwedî roleke girîng e, bi germbûna hewayê re ji şaneyên xwe derdikeve û dest bi berhevkirina şîravê dike.
Pirpirîk : Ne tenê bi rengên xwe bedewî û zindîtiyê didin xwezayê, lê belê di bergirtina gulan de jî xwedî roleke sereke ne.
Xalxalok: Ev kêzika dostê cotkaran, bi taybetî di biharê de derdikeve ser şînatiyan û kêzikên biçûk yên zirardar yên mina kinfan dixwe.
Morî: Germbûna axê moriyan ji hêlînên wan derdixe. Ew piştî xeweke dirêj, dest bi xebateke giran a komkirina xwarinê ji bo zivistanê dikin.
Mêşên Reş û Kesk: Ji ber germbûnê bi lez zêde dibin. Ew zêdetir li ser qirêjiyê kom dibin û dibin sedema nexweşiyan .

**Havîn: Demslaa herî guncaw ji bo kêzikên xeternak**

Demsala havînê bi germahiya xwe ya zêde tê naskirin. Ev germahî tevgera gelek kêzik, meş û ajalên bi jehr zêdetir dike. Di vê demsalê de rêjeya mêşan li gorî biharê pir zêdetir dibe û rîskên mezin bi xwe re tîne.
Pêşû: Ji ber zêdebûna qadên şînatiyê û hebûna bermayiyên çopê, hejmara wan pir zêde dibe. Ev pêşû ji bo tenduristiyê xeternak in û dibin sedema nexweşiyên çerm û verûsî.
Kêzikên Din: Di vê demsalê de çirçirk û şeqemar jî herî zêde li derdorê tên dîtin.
Payîz û zivistan: Di werzê zivistanê de, ji ber sermaya dijwar, pir kêm kêzik li derve tên dîtin.  kêzikên li ser bejahiyê, ji bo xweparastina ji seqemê, di bin axê de, di qurmên daran an jî di bin kevirên mezin de diçin xeweke kûr.

**Guhertina avhewayê û derketina cureyên nû yên kêzikan**

Di derbarê mijarê de Mamosteyê Beşa Çandiniyê li Zanîngeha Rojava, Xêredîn Mûsa ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Niha di vê serdemê de, ji ber guhertinên gerdûnî yên avhewayê, hin cureyên nû yên kêzikan berê xwe dane herêmên me. Mînak;



kuliyê rih-dirêj û kuliyê serî-dirêj. Ev cureyên kuliyan zirareke mezin didin şînatî û berhemên çandiniyê. Her berhemeke ku kulî pê ve diçe, ziyanê dibîne û ev yek bandoreke xerab li aboriya çandiniyê dike."
Mûsa di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku di bihar û havînê de cûreyên pirpirîkan li ser gulan û şînatiyan pir dibin, lê li rex wan cureyên wek sirsirk, dûbişk û mêşên qirêj jî zirarê digihînin tenduristî û aramiya mirovan."



# Landika şoreşê û cihê têkbirina DAIŞ'ê Kobanê ye, ne Eyn El-Ereb e

Guhertina navê Kobanê bo Eyn El-Ereb dîsa bûye rojev. DAIŞ'ê xwest navê wê bike Eyn El-Îslam, berî wê jî rêjîma Baas û niha jî hikumeta demkî ya Sûriyê dixwazin navê Kobanê bikin Eyn El-Ereb. Ev hewildan berdewamiya siyaseta erebkirinê ye ku armanca wê jêbirina nasnameya dîrokî û çandî ya Kurdan e. Lê dîrok û nasnameya gelan bi biryarên siyasî nayên guherandin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**




**Pêşketin û danûstendinên yekem**

Piştî Kanûna 2025'an li Sûriyê guhertineke giştî pêk hat. Her çiqas piraniya gelên Sûriyê bi hêviya guhertina rejîmê û destpêkirina qonaxeke nû bûn, lê desthilata ku piştî van guhertinan hat, ne bi daxwaz û hêviyên hemû pêkhateyên civaka Sûriyê bû. Tevî vê yekê ev guhertin bû sedema ku welêt derbasî qonaxeke nû bibe. Ev qonax ji aliyê hin kesan ve wekî qonaxa veguhêzê hate binavkirin, lê hin jî wê wekî qonaxa avakirina Sûriyeke nû bi zihniyeteke nû nirxandin. Di encama vê veguherînê de li seranserê Sûriyê gelek pêşketin û guherîn di warên siyasî, civakî, aborî, îdarî û rêxistinî de pêk hatin. Ev pêşketin hemû herêmên Sûriyê dihewand, di nav de herêmên Kurdan ango Bakur û Rojhilatê Sûriyê (Rojavayê Kurdistanê) jî. Di vê çarçoveyê de deriyê diyalog û lihevkirinê di navbera nûnerên Rojava û hikumeta demkî ya Sûriyê de hate vekirin. Armanca bingehîn ew bû ku bi rêya danûstandinan çareseriyek siyasî ji bo pirsgirêkên heyî were dîtin û şertên avakirina Sûriyeke aram û yekbûyî werin amadekirin. Ji bo vê armancê nûnerên her du aliyan ketin nava danûstandin û lihevkirinan. Gava yekem a van lihevkirinan bi Peymana 10'ê Adarê encam da. Piştî wê di çarçoveya heman peymanê de çend lihevkirinên din jî hatin çêkirin. Lê belê pêvajoya bicihkirina van lihevkirinan bi gelek astengan re rû bi rû ma ku şert û mercên navxweyî û bandora hêzên derve li ser hebû, lewra di encama planeke navnetewî de lihevkirin neçû serî û di şûna pêşketina danûstandinan de, ji aliyê hikumeta demkî ya Sûriyê ve şer û alozî derketin pêş. Ji bo ku pêşî li vê rewşê were girtin û diyalog li şûna şer serdest bibe, peymaneke nû (Peymana 29'ê Çileyê) di navbera Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî û Serokkomarê hikumeta demkî ya Sûriyê, Ehmed El-Şeraa de, hate îmzekirin. Ev peyman wekî gaveke nû ya siyasî hate nirxandin ku dikare şertên pêşvebirina danûstandinan ji nû ve amade bike. Herwiha ev lihevkirin bi taybetî ji bo parastina herêm û civaka Kurd girîng bû. Di heman demê de li gorî şertên peymanê ew bû ku saziyên îdarî û sivîl ên Rêveberiya Xweser bi saziyên dewletê re li gorî mekanîzmayek hevbeş bên rêxistin û her du alî bi armanceke hevpar ji bo avakirina Sûriyeke aram, yekgirtî û domdar bixebitin. Bi vî awayî pêvajoya siyasî li şûna şer û pevçûnan bû rêya bingehîn a çareserkirina pirsgirêkên Sûriyê.

**Lihevkirina statejîk**

Lihevkirina 29'ê Çileyê ne tenê lihevkirineke di navbera du aliyan de ye, lê gavak stratejîk û dîrokî ye ku dikare siberoja Sûriyê bi awayekî erênî bandor bike. Ev lihevkirin derfeteke girîng afirand ku tecrûbe û modela Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ji bo hemû herêmên Sûriyê were belavkirin û sûd jê were girtin. Di heman demê de yek ji aliyên herî girîng ên vê lihevkirinê ew e ku rastiya civakî ya Sûriyê tê nasîn. Sûriyê ne welatek yekreng e, ew welatek pirreng, pirçand û pirnasname ye ku gelek netewe, ol, bawerî û çand tê de bi hev re dijîn. Ji ber vê yekê hemû pêkhateyên civakê mafê xwe yê wekhev hene ku di rêvebirin, biryardan û avakirina siberoja welatê xwe de beşdar bin. Serkeftina vê lihevkirinê wê bandoreke mezin li ser tevahiya Sûriyê hebe. Lê guhertina zihniyeta hikumeta demkî ya Sûriyê pêdiviya sereke ye, lê mixabin ev yek pêk nayê û zihniyeta Baasê di şêwazê hikumeta demkî de xwe dide domandin.

**Zihniyeta hikumeta Şamê**

Her çiqasî hikumeta demkî ya Sûriyê û nûnerên Rojava xwedî hizrên cuda bin, lê lihevkirin wê cudabûnê dide aliyekî û pêkanîna lihevkirinê xwe ferz dike. Lê çi derkeve pêş? ku hikumeta demkî mîna rêjîma Baasê ye. Ji ber hikumeta demkî ya Sûriyê di rastiyê de berdewamiya rêjîma Baasê ya hilweşiyayî ye. Çawa? Ji ber ku zihniyeta niha li Şamê tê meşandin, ji zihniyeta sîstema rêjîma Baasê tu cudabûn nîne, tenê kesayet hatine guhertin. Paşguhkirina gelên Sûriyê wek berê berdewam kiriye û roja îro hîn zêdetir bûye. Nebûlkirina jinê tê kirin. Aboriya welat deh qat xerabtir bûye û buhayên jiyanê li ser gel hîn zêdetir bilind bûne. Rewşa nearamî û neewlehiyê di asteke bilind de ye. Tevgera çeteyên DAIŞ'ê di Sûriyê de zêde bûye, lê li hember vê yekê hikumet bi berjewendiyên xwe yên bi dervere re mijûl e û agirê li hundir hîn zêdetir gur dibe. Di heman demê de ya dîsa xwe dubare dike kembera Erebî ye ku bi destê rêjîma Baasê dest pê kiribû, hikumeta demkî jî îro dixwaze wê projeyê bidomîne.

**Siyaseta guhertina navan**

Di serdema rêjîma Baasê de li Rojavayê Kurdistanê siyasetekî berfireh a erebkirinê dihat meşandin. Yek ji aliyên vê siyasetê guhertina nasname, navên kesan, malbatan, paşnavan, gundan, bajar û deveran bû. Armanca vê siyasetê ew bû ku şopa dîrokî û nasnameya neteweyî ya Kurdan were paşguhkirin û hebûna wan li ser axa wan, were bêbandorkirin û tunekirin. Di vê çarçoveyê de navên gelek bajar û deveran hatin guhertin. Bo nimûne, Qamişlo wek Qamişlî, Amûdê wek Amûda, Dirêbasiyê wek Dirbasiya, Dêrik wek Malikiyê, Serê Kaniyê wek Ras El-Eyn û Kobanê wek Eyn El-Ereb dihatin binavkirin. Ev guhertin ne tenê guhertina navan bûn, lê beşek ji projeyek siyasî bûn ku armanca wê têkbirina nasnameya Kurdî û pêşxistina karaktera Erebî ya herêmê bû. Îro piştî hilweşîna rêjîma Baasê jî, ev zihniyet bi awayekî din dîsa tê dubarekirin. Nimûneya vê yekê biryara li ser tabelaya dadgeha bajarê Hesekê bû ku tê de hat daxwazkirin ku nivîs tenê bi zimanê Erebî be. Herwiha guhertina navê bajarê Kobanê jî dîsa ketiye rojevê û hewildan hene ku navê wê bi Eyn El-Ereb were guherandin. Ev jî vê yekê dide tekezkirin ku berdewamiya siyaseteke kevin tê kirin, armanca wê paşguhkirina nasnameya dîrokî û çandî ya Kurdan e. Lê parastina navên resen ên bajar, gund û deveran, parastina bîra dîrokî, çand û hebûna gel e, gelê Kurd jî hebûna xwe her parastiye. Bi taybetî Kobanê ji bo gelên Kurd li ser asta cîhanê sînorê sor e ku nabe kes nêzî wê bibe û nasnameya wê bide guhertin.

**Çima Koban û ne Eyn El-Ereb?**

Li ser binavkirina Kobanê gelek çîrok hene, lê rastiya navê Kobanê li gorî tê gotin ew e ku ji vir tê; ku Eşîrên Kobanê di nava xwe de û di encama hevpeymanekê de ji hevdû cuda dibin û navê xwe jî dikin "Koma banî" û ya din jî "Koma Jêrî." Navê Eşîra Koma Banî bi demê re dibe Kobanê. Lê di dema Rêjîma Baasê de Kobanê bi navê Eyn El-Ereb dihat binavkirin. Ji ber ku di Kobanê de kaniyek ku ji Rojhilatê Kobanê dihat, Ereban li wir pezên xwe av didan. Piştre kanî ziwa bû û wê demê siyaseta erebkirinê dest pê kir, lewma dîsa Kobanê bi Eyn El-Ereb dihat binavkirin, saziyên dewletê jî bi fermî wê wisa pênase dikirin. Ji salên 1923'an heta 2011'an Kobanê di destê rêjîma Baasê de bû. Lê di 19'ê Tîrmeha 2012'an de gel rabû ser piyan û rêjîm ji Kobanê derxistin. Lewra piştî wê reseniya navê Kobanê vegeriya û dîsa Kobanê hate nivîsandin.

**Dîroka kobanê û berxwedana wê di serdemê de**

Kobanê xwedî dîrokeke kûr û kevnar e. Di nav gelek qonax û guhertinên dîrokê re derbas bûye, lê navê wê her tim Kobanê maye. Ev rastiyek dîrokî ye û kes nikare dîroka navê Kobanê înkar bike an jî wê ji bîr bibe. Ji bo parastina Kobanê bi hezaran şehîd canê xwe feda kirin. Bi berxwedana wan, Kobanê neket û bû nîşana azadî, berxwedan û serbilindiyê. DAIŞ'ê xwest navê wê biguherîne û bike Eyn El-Îslam. Berî wê jî rêjîma Baas û niha jî hikumeta demkî ya Sûriyê heman armancê didomînin û dixwazin navê Kobanê bikin Eyn El-Ereb. Lê dîrok û îradeya gelan bi biryarên siyasî nayên guherandin. Kobanê, Kobanê ye û dê her tim bi vî navî were nasîn. Hewldanên guhertina navê Kobanê tenê guhertina navekî nînine, ew nîşana zihniyeteke paşverû, nijadperest û yekrengker in. Armanca rastîn jî ne tenê guhertina navê bajêr e, jêbirina nasnameya dîrokî, çandî û neteweyî ya gelê Kobanê ye. Lê dîrok û bîra gelan bi zorê nayên jêbirin û navê Kobanê wekî sembola berxwedanê dê bimîne. Ya girîng jî Kobanê ji bo Kurdan û gelên ku piştgirîya doza Kurd dikin girîngiyeke sembolîk a mezin heye, ji ber ku ew cihê jidayikbûna Şoreşa 19'ê Tîrmehê û cihê berxwedana dîrokî ya li dijî DAIŞ'ê ye.

**Israra Kurdan a li ser parastina herêmên xwe**

Gelê Kurd û gelên din ên herêmê ne tenê navê Kobanê, lê hemû navên resen û dîrokî diparêzin û ji bo parastina wan berxwedanê dikin. Navên dîrokî beşek ji nasname, çand û mîrateya gelan in, ji ber vê yekê her hewildanek ku armanca wê guhertina wan be, di nav civakê de bertekên xurt derdixe holê. Ger îro mijar Kobanê ye, sibê dibe ku herêmek din bibe armanc. Ji ber vê yekê pirs tê kirin, israrbûna hikumeta demkî ya li ser vê mijarê xwedî çi armancê ye? Ma armanc guhertina navê dîrokî yê Kobanê ye, an jî ev gav beşek ji projeyekê ye ku guhertina demografîk a herêmê armanc dike û vê pêvajoyê bi guhertina navên Kurdî dest pê kiriye? Her çi armanc be, berteka gelên Kobanê û gelên herêmê îro li kolanan bi awayekî eşkere tê dîtin Ji ber vê yekê divê hikumet berî ku her biryarê bide, vegere ser lêkolînên dîrokî û belgeyên zanistî, da ku rastiya dîrokê ji bo wê baştir were nasîn.

# Lûtkeya NATO'yê bo Şera davikeke siyasî yan serkeftineke dîplomatîk e?

Her ku hikumeta demkî gavên mezin di çarçoveya navdewletî de diavêje, erkê wê û ihtîmla ketina nav davikên herêmî mezintir dibe. Lûtkeya NATO'yê û planên wê di dema heyî de ji bo Rojhilata Navîn xeternak in û dibe ku di nav van planan de lingê hikumeta demkî bişemite nav kirîzeke bêserûber.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Wekî yekem car hikumeta demkî ya Sûriyê beşdarî civînên girêdayî lûtkeya NATO'yê li Enqerê bû. Li gorî medyaya Sûriyê ev beşdarbûn di çarçoveya bichkirina siyaseta stratejîk a nû ya ku Şam ji bo xwe di nav avahiya pergala navneteweyî de çêkiriye herwiha ji ber dema ku lûtkeya NATO tê lidarxistin, guhertinên mezin ên jeopolîtîk li herêmê û cîhanê pêktên.

Ehmed El-Şaraa roja duyemîn a lûtkeya 36'emîn a NATO'yê, gihaşt Enqerayê, beşdarbûna di civînan de ji bo pêkanîna hin armancên siyasî yên kûr çêbû, hem jî ji bo berfirehkirina têkiliya navneteweyî bi Şamê re.

Li gorî daxuyaniyek ji serokatiya Sûriyê, piştî gihîştina serokê Sûriyê bi şandeyek ji endamên Kongreya Dewletên Yekbûyî û nûnerê taybet ê serokatiyê yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Sûriye û Iraqê, Thomas Barrack, bi amadebûna wezîrê Derve yê Sûriyê Esed Şeybanî re civîn hat lidarxistin. Wezîrê Bazirganiyê yê Tirkiyê Omer Polat piştî gihîştina Şaraa di roja duyemîn a civîna bilind a NATO'yê de li Enqerê, pêşwaziya wî kir.

Şaraa di hevdîtinên xwe yên li kêleka civîna bilind de li ser gelek mijaran nîqaş dike. Rojnameya fermî ya Sûriyê El-Sewre ragihand ku ev mijar têkoşîna li dijî terorîzmê, pêşeroja Hizbullahê, çekên komên çekdar, kontrola sînoran û da ku Lubnanê nebe qadek ji bo çareserkirina hesabên herêmî.


Herwiha li ser kontrolkirina sînoran û sînordarkirina operasyonên qaçaxçîtiyê, hevkariya di têkoşîna li dijî madeyên hişber de, rakirina qeydan li ser aboriya Sûriyê, piştgiriya aramiyê û aktîvkirina saziyên Sûriyê. Her kesê ku dixwaze nexşeya Rojhilata Navîn bixwîne nikare Sûriyê paşguh bike. Her kesê ku dixwaze ewlehiya Lubnan, Iraq, şerê li dijî komên çekdar vegerandina hevsengiya herêmî nîqaş bike, nikare Sûriyê derbas bike. Sûriye ne tenê welateke û li ser nexşeyê ye, ew di cihekî stratejîk de ye.

**Xetên sor**

Tevî ku hikumeta demkî xwe bi van têkilî, civînên kêleka NATO'yê û hwd… dibîne û ji bo xwe van tiştan bi kar tîne, hem jî hîs dike ku dikare her tiştî li Sûriyê bike, lê xetên sor li pêşiya wê hene nikare wan derbas bike. Xet û mijara herî zehmet di dema heyî de pêkanîna êrişan li dijî Hizbullahê ye, eger Colanî vê gavê neavêje serê wî di belaya Îsraîl û Amerîka yê de ye û eger bike jî serê wî dikeve ber xencerên Tirk û Osamaniyan, di heman demê de wê şerekî mezin di navebera Lubnan û Sûriyê de derkeve, komên girêdayî Îranê yên li Îraqê jî wê li dijî hikumeta demkî êrişan bikin. Xeta din entegrasyon e û lihevkirina hikumeta demkî û QSD'ê ya 29'ê Çileyê ye. Weke tê zanîn ku zêdeyî 6 meh in ev peyman hatiye îmzekirin, hîna jî ji ber destwerdana dewleta Tirk û siyaseta hikumeta demkî ya Sûriyê xalên peymanê bi cih nehatine. Eger ev lihevkirin negihêje serî û têkbiçe ew ê tevlîheviyeke mezin were afrandin, ji xwe di roja îro de Sûriyê di kirîzeke ewlehî û aborî re derbas dibe, lê wê ev kirîz xûrtir bibe. Lûtkeya NATO'yê hat lidarxistin, tekez e ku armancên dewleta Tirk ên qirêj li hemberî gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê hîna weke xwe ne, lewma dixwaze hikumeta demkî ji bo xwe bi kar bîne da ku Kurd, partiyên Kurdî û QSD ji siberoja Sûriyê bêpar bimînin, ev yek jî xeta sor e ji bo gelê Kurd.

**Sûriyê wê bibe Hurmiza duyem?**

Ji serdema kevin ve Sûriyê bi cihê xwe yê stratîjîk ê aborî tê naskirin, rêya Herîr a bazirganiyê



di Sûriyê re derbas dibû, Sûriyê, cîhan û herêm ji vê rêyê sûd werdigirt, di heman demê de hêzên serwer ên cîhanî bi rêya vê xeta aborî berjewendiytên xwe pêktanîn. Îroj hin hêz di serî de dewleta Tirk bi rêya NATO'yê vê rêyê ji bo xwe bide vejandin, lê bi nav, rê û planên nûjen dixwaze Sûriyê bibe beşek ji planê. NATO hewl dide ku Sûriyê tevlî rêkeftinên aborî û ewlehiyê yên berfirehtir bike, armanc jê ew ew ku Sûriyê bibe beşek ji tevlîheviya herêmî, nemaze di rageşiyên leşkerî yên nû di navbera Washington û Tehranê de li Tengava Hurmuzê, hem jî mijara destwerdana hêzên hikumeta Sûriyê ji bo Hizbullahê. El-Şaraa di hevdîtina xwe ya roja Sêşemê de bi Serokê Fransayê re li Şamê diyar kir ku piştî krîza Tengava Hurmuzê, cîhanê nirxê rêyên avê yên ewle û aram fêm kir. Wî Sûriyê weke cihekî herî aram da pênasekirin, armanc jî ew e ku peymanên aborî ji bo berjewendiyên xwe îmze bike hem jî desntnîşan kir ku cihê stratejîk ê Sûriyê weke Deryaya Spî bi Kendava Erebî û Iraqê ve girêdide û ev rê dikare xizmeta Fransayê bike. Lûtkeya NATO'yê di nava danûstandin û têkiliyên Sûrî-Amerîkî yên pêşketî de hat lidarxistin. Ji serdema cezayên Qeyser ber bi qonaxeke nû bû ku bi diyaloga avaker û hevkariya stratejîk ve di navbera Şam û hin hêzên navdewletî de bi taybet Amerîka dihate diyarkirin. Rêya Geşedanê ya ku ji Berava Faw a Îraqê tê hundirê Îraqê û derbasî Sûriyê da ku here Tirkiyê xeteke aborî ya nû ye ku dewleta Tirk dixwaze di siberojê de pêkbîne, lê gelo wê Îsraîlê qebûl bike? Gelo Sûriyê wê bikaribe bikeve şûna Tengava Hurmizê da ku hikumat demkî bala cîhanê bikişîne ji bo îmzekirina peymanên aborî?

**Sûriyê di navbera planên Îrarîl û Tirkiyê de**

Piştî rûxandina rêjîma Baas Korîdora Dawûd dîse kete rojeva Îsraîlê, planên Îsraîlê ji nû ve derketin holê ya sereke jî parçekirina Sûriyê bû. Projeyê armanc dike ku bandora Îsraîlê li herêmê xurt bike nexasim di qada ewlehî û aramiya Rojavayê Asyayê de, hem jî qada aborî û lihevkirina bi dewletên herêmê re di bin siya Peymana Ibraham de. Ev korîdor ji Bilindahiyên Colanê yên, di nav parêzgehên başûrê Sûriyê yên wekî Quneytra, Deraa û Siweydayê re derbas dibe, di nav deverên stratejîk ên wekî Tenf û Dêrazorê de diçe herwiha deverên bakurê û rojhilatê Sûriyê û Başûrê Kurdistanê û Iraqê dirêj dibe. Lê belê, ew ne tenê rêyek erdnîgarî ye, lê amûrek jeopolîtîk, aborî û demografîk e, armanc jê xurtkirina serweriya herêmî ya Îsraîlê ye. Korîdora Dawûd ji rêze korîdorên ku Îsraîlê dixwaze planên xwe bighîne serî ye, ew temamkera Korîdora Netzarim li Xezayê û Korîdora Filadelfî li ser sînorê Xeze-Misrê ye. Armancên stratejîk ên projeya Korîdora Dawid li dora çar aliyên bi hev ve girêdayî dizivirin. Li ser eniya ewlehiyê, ev proje hewl dide ku xetên dabînkirina bejahî yên Îranê ji bo Hizbullahê li Lubnanê qut bike. Hikumeta demkî bi biryara Îsraîl û Tirkiyê hat ser desthilatdariyê, her aliyek ji wan armanceke cuda heye, her aliyek erkeke cuda û dijî hev davêjin ser milê Colanî û hikumeta wî. Îsraîl hîna bi çavê terorîzmê li hikumeta Sûriyê dinere û dewleta Tirk hewl dide vî navî jê dûr bixe, ev yek di civînên lûtkeya NATO'yê de hatin nîqaşkirin û Trum biryar da ku navê terorê an jî dewleta ku piştgiriyê dide hêzên teror ji lîsteyên reş rake. Em dibînin du rêyên aborî yek jê Korîdora Dawûd, ya din rêya Geşedanê li hemberî hev disekinin, Îsraîlê ji xeta Tirkiyê ne razî ye û Tirkiyê ji rêya Îsraîlê ne razî ye, di çarçoveya siyasî de jî lihevkirin tune, berî çend heftiyan me dît ku çawa qirkirina Ermeniyan dîse piştî 111 salan bû rojev ji hêla Îsraîlê ve. Em dibînin her ku nakokî di navbera Îsraîl û Tirkiyê de çêdibin, hikumeta demkî xwe winda dike, lê ya herî girîng ji bo Şaraa û hikumeta wî, domandina desthilatderiyê ye.



# Di her pêşketinekê de afirandinek

Ji destpêka avakirina Zanîngeha Rojava û heya roja îro, xwendekar di nava pêşketineke domdar de ne, êdî her tiştî bi fikir û jêhatiyên xwe diafirînin. Xwendekaran diyar kirin ku her projeyek ji bo wan gavavêtina ber bi pêşerojê ve ye.

**Aylîn Ehmed /Qamişlo**

Zanîngeha Rojava yek ji girîngtirîn navendên akademîk ên Rojava ye ku bi hezaran xwendekar lê perwerde bûne û derçûne. Di her beşekî zanîngehê de pêşketineke berçav heye û her xwendekarek bi hêz û hişê xwe tevdigere. Ji ber vê yekê, bi taybetî xwendekarên beşên zanistî di pêşketineke kûr re derbas diben û tiştên nû diafirînin. Xwendekarên zanîngehê di nav çend mehan de projeyên cihêreng amade kirin. Ev projeyên ku di beşên zanistî de hatine çêkirin, di 29 û 30'ê Pûşperê de di pêşengeha zanîngehê de hatin nîşandan. Projeyên ku herî zêde bala serdêran kişandin robot û makineyên elektrîkî bûn. Li ser vê mijarê, xwendekarên beşên elektronîkê Mihemed Îsa û Solîn Hesen ji rojnameya me re axivîn.



Mihemed Îsa



Solîn Hesen

**'Projeya me makineya elektrîkî bû'**

Mihemed Îsa diyar kir ku projeya wî çêkirina makineyeke elektrîkî bû û wiha anî ziman: "Pirojeya me li ser makineya elektrîkî bû. Mebesta me ya bingehîn ew bû ku di vê serdemê de mazot û benzîn pir buha bûne, ji ber wê me xwest em amûreke elektrîkî biafirînin da ku her kes bikaribe bi hêsanî bimeşîne. Dema ku me ev çêdikir, em rûbirûyî gelek astengiyan bûn, ji ber ku parçeyên wê kêm bûn; tevî vê yekê jî me hemû parçe ji dukanên Qamişlo peyda kirin. Di pêvajoya çêkirinê de tenê em sê xwendekar û mamosteyek bûn, xebatê jî nêzîkî çar-pênc mehan ajot heya ku bi dawî bû. Hêviya me ew e ku aliyên peywendîdar di dabînkirina parçeyan de bibin alîkar, da ku em projeyên xwe berfireh bikin û di pêşerojê de tiştên hîn bikêrtir ji bo civakê biafirînin."

**'Projeya me ji bo xizmeta civakê bû'**

Solîn Hesen jî bal kişand ser girîngiya projeya xwe û wiha got: "Îro armanca me ya sereke ew e ku em tiştên weha çêbikin ku fêdeya wan ji civakê re hebe. Ji ber vê yekê me robotek çêkir da ku wekî alîkar xizmeta nexweşxane, xwaringeh û kesên temenmezin bike. Me du meh û nîvan li ser vê projeyê xebat kir, ji ber ku dîtina parçeyan pir zehmet bû. Ev robot hem bi pîlan dixebite û hem jî bi riya kontrolê tê birêvebirin. Ev ji bo me pêşketineke mezin e ku em îro dikarin ji bo civaka xwe tiştên bi fêde berhem bînin."

# Nexweşiya Kolêra; Sedem û pêşîlêgirtin


**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Kolêra nexweşiyeke bakterî ye ku bi gelemperî bi ava qirêj belav dibe. Ew dibe sedema zikçûna giran û zuhabûna laş, ger neyê dermankirin, ew dikare di nav çend demjimêran de bibe sedema mirinê.**

Kolêra bi sedsalan e tê zanîn, lê yekem pêketina bi kolêrayê ya belgekirî di sala 1817'an de li herêma Deltaya Çemê Ganc a Hindistanê dest pê kir û dûv re li beşên mezin ên Asya, Rojhilata Navîn û Afrîkayê belav bû. Niha bi saya kanalîzasyon û paqijkirina avê ya nûjen, nexweşiya kolerayê li welatên pîşesazîkirî hema hema ji holê hatiye rakirin. Lêbelê, ew hîn jî li Afrîka Başûr û Rojhilatê Asyayê heye. Xetera nexweşiya kolerayê zêde dibe dema ku xizanî, şer an karesatên xwezayî mirovan neçar dikin ku di şert û mercên qerebalix de bêyî kanalîzasyona têrker bijîn.

**Nîşaneyên nexweşiyê**

Piraniya kesên ku bi bakteriya kolerayê (Vibrio cholerae) ketine destpêkê nîşaneyên nexweşiyê li wan xuya nake û nizanin ku ew nexweşin. Ji ber ku nçaneyên nexweşiyê ji 7 heta 14 rojan li mirov xuya dike. Ji ber wê bêyî ku kesê nexweş zaibe ew nexweşiyê vedughêze kesekî din. Lêbelê, piraniya bûyerên kolêrayê bi zikçûna sivik heta navîn derdikevin holê. Lêbelê, hin kes nîşanên giran ên kolêrayê pêşve dixin, ku pir caran di nav çend rojên pêketinê de xuya dibin.



**Nîşaneyên pêketina kolêrayê ev in:**

-Zikçûna kolêrayê ji nişka ve tê û dikare bibe sedema windabûna şilavek girîng.
-Vereşîn û dilxelandin.
- Zuhabûna laş di nav çend demjimêran de piştî destpêkirina nîşanên kolerayê pêş dikeve û dikare ji sivik bigire heya giran.

**Sedem pêketina vê nexweşiyê**

Pêketina kolêrayê ji ber cureyekî bakteriya bi navê Vibrio cholerae çêdibe. Bandorên kujer ên nexweşiyê ji toksînekê derdikevin ku bakterî di roviya zirav de çêdikin. Ev toksîn dibe sedema ku laş gelek av derxe, ku dibe sedema zikçûnê û windabûna bilez a şilav û xwêyan. Çavkaniyên ava qirêj çavkaniya sereke ya pêketina kolêrayê ne. Bakterî dikarin di van rewşan de werin dîtin: zuhabûn dibe sedema ku laş zû mîneralan winda bike, ku berpirsiyarê parastina hevsengiya şilavê ne.

Rûyê axê an ava bîrê, bîrên giştî yên qirêj gelek caran dibin çavkaniyên nexweşiya kolêrayê ya di asta mezin de. Kesên ku di şert û mercên qerebalix de dijîn û bêyî paqijiya guncaw in, bi taybetî di xetereyê de ne.

Xwarina masiyên deryayî yên xav an jî nebaş pijandî, nemaze masiyên deryayî yên ji hin herêman, dikare we bi bakteriya kolêrayê re rû bi rû bihêle. Bûyerên kolêrayê yên vê dawiyê li Dewletên Yekbûyî hatine şopandin ku digihîjin xwarinên deryayî yên ji Kendava Meksîkayê. Fêkî û sebzeyên xav û bêqalik li deverên ku lê kolêra heye çavkaniyek pir caran a pêketina bi kolêrayê ne.

Li deverên ku kolêra belav bûye, genimên qirêj ên wekî birinc û genimê ku piştî pijandinê çend demjimêran di germahiya odeyê de tên hiştin, dikarin bakteriya kolêrayê veşêrin.

**Faktorên xweteriyê yên ji bo kolerayê ev in:**

Paqijiya nebaş, Kolêra di rewşên ku parastina jîngehek saxlem, di nav de dabînkirina ava ewle, dijwar be, îhtîmalek mezintir heye ku pêş bikeve. Ev rewş li kampên koçberan, welatên xizan û deverên ku birçîbûn, şer an karesatên xwezayî dijîn gelemperî ne.

Asîda gedeyê kêm an tune, bakteriyên Kolêrayê nikarin di jîngehek asîdî de bijîn û asîda gedeyê ya normal bi gelemperî wekî parastinek li dijî pêketina vê nexweşiyê tevdigere. Lêbelê, mirovên ku asta asîda gedeyê kêm e, wek zarok, kal û pîr û kesên ku antasîd, astengkerên H2, an astengkerên pompa proton digirin, ji vê parastinê bêpar in û ji ber vê yekê ji kolêrayê re bêtir hesas in.

Pêketina ji malê, ger hûn bi kesekî/ê re bijîn ku nexweşî heye, îhtîmala ku hûn bi kolêrayê bigirin zêdetir e. Grûpa xwînê O, ji ber sedemên ku bi tevahî ne zelal in, mirovên bi koma xwîna O du caran ji mirovên bi komên xwîna din bêtir îhtîmal e ku bi kolêrayê bigirin.

Xwarinên xav an jî kêm pijandî, her çend welatên pîşesazîkirî êdî nexweşiya kolêrayê yên di pîvanek mezin de tecrûbe nakin jî, xwarina xwinên masûlkeyan ji avên ku tê zanîn ku bakterî vedihewîne, xetera we ya pêketin ê zêde dike.

**Pêşîlêgirtin**

Tedbîrên pêwîste bên girtin:
Şûştina û paqijiya destan, vexwarina ava ewle û paqij, tenê xwarina bi tevahî pijandî û germ bixwin û heke gengaz be ji xwarina kolanan dûr bisekinin. Heke hûn xwarin ji firoşkarek kolanan bikirin, pê ewle bin ku ew li ber çavên we tê pijandin û germ tê pêşkêş kirin. Bi fêkî û sebzeyên ku hûn dikarin bi xwe qalik bikin, wek mo z, porteqal û avokado, ve mijûl bibin. Ji selete û fêkiyên ku nayên qalik kirin, wek tirî û berûyan, dûr bisekinin.

**Bîra Civakê**



## Dîrok bîra civakan e

**Rênas Efrîn**

Dîrok zanisteke li ser tevahiya jiyana civakî ya mirovan lêkolîn dike. Cih, dem, sedem, encam û berhemên destkeftî digire dest. Mijara dîrokê bi hemû aliyên xwe ve bûyer û serpêhatiyên mirovahiyê ne. Dîrok ne tenê hafîzayeke civakî ye ku bûyeran tomar dike, lê belê ew dergûşa gerdûnê ye, rastiyên mirovahiyê nifş bi nifş diparêze û ji bo civakên nûjen dike rastiyeke lêvegerînê. Yek ji zanistên civakê ye, lewra pêwîst e bi rêbazeke diyar bê lêkolînkirin. Her ku dem di ser mirovahiyê re bibore, dibe malê dîrokê. Mînak, her pêvajo bi serê xwe dîrokeke. Di vê wateyê de jî li hember dîrokê bi eniyeke paqij û vekirî, li pêşberî paşêrojê bi hêviyek mezin mirov radibe û rê werdigere. Bêguman encam serkeftin e.

Di ronîkirina bûyerên dîrokî de xalên bingehîn ev in: Bûyerên dîrokî di demên borî de, di dem û cihên diyar de derketine holê. Derdorên cografîk û mercên xwezayî yên civaka jiyayî pir girîng in. Awayê jiyanê û pêşketinên wan, girêdayî rewşa wan a cografîk e. Bi bandora dîrok û cografyayê xwediyê xisletên cihêwaz in ku ev yek îro jî bi hêsanî tê dîtin. Di encama vê yekê de herikîna dîrokê, li derdorên cihê de bi awayên cuda pêk hatine. Tiştek bê dem û bê cih nabe.

Em di nav xebat û têkoşîneke dîrokî de ne, lê ti tevgereke şoreşger ewqasî lêdanê qebûl nake. Wekî ku tê zanîn dîrok bi qasî îfadeya bîr û hafizeya civakî ye, ewqas jî îfadeya em kî ne, ji kur hatine û çawa dijîn e jî. Li dijî dîroka serdestan, derxistina holê ya dîroka me ya cewherî, watedarkirin û li ser wê avakirina pêşerojê, sedema hebûn û nasnameya me ye. Bi xwedîderketina hemû mîrasên dîrokê yê civaka exlaqî-polîtîk, hegemonyaya pergala kapîtalîst derbas kir û di asta herêmî-gerdûnî de hesta hêvî, bawerî, moral û jiyana azad di nav mirovahiyê de afirand. Dîrok bi aliyên xwe yên heyberî û rewanî ve pireke di navbera dema derbasbûyî û dema bê de hatiye sazkirin e û guftûgoyeke berdewam e. Cîvaka ku dîroka xwe nizane, dişibe mirovek hişê xwe windakirî. Di heman demê de piraniya dîroka mirovahiyê bi destê dagirker û desthilatan hatiye nivîsîn. Lewma dîrok gelekî hatiye berovajîkirin û gelek aliyên wê di tariyê de mane. Mebest ew e, ew tiştên heya niha mirov fêr bûne, dibe ku gelek ji wan bigihin rastiya xwe ya resen û bêne guhertin. Ji bo gelê Kurd fêrbûna dîrokê pir girîng e.

Dîrok, hiş û bîra mirovahiyê ye. Dîrok ji bo bi zanebûn sazûmankirina dema bê jêdera herî girîng e û pêwîst e mirov serî lê bide.

Em nikarin dîrokê ji hev du qut bikin û li gorî şert û mercên serdestan vebêjin, gotina ku dibêje: "Yên serkeftî dîrokê dinivîsînin" gotineke tewş e û nabe malê dîrokê, ji ber ku xwediyên dîroka bi hezar salan civak in û çendîn civak rastî qirkirinan hatibin û nikarîbin dîrok rast şîrove kiribin, bêguman rastiyeke veşartî di nava dîrokê de hiştine, şopeke ku nayê windakirin û herifandin li pey xwe hiştin e, vaye şûnwarên dîrokî çendîn rastî topbaran, erdhej û guhertina demografîk hatine jî, lê dîsa ji aliyê xwediyên xwe ve weke ronahiyê tê dîtin. Civak bi nivîsandina dîrokê bîr û hafîzeya xwe dike rastiyeke ku neyê windakirin. Nexasim gelê kurd di rêveçûna dîrokê de çendîn rastî jiholêrakirina dîroka xwe ya kevnar hatin, çendîn hêzên dagirker şûnwarên dîrokî binav kirin û hewla têkbirina nîşaneyên hebûna gelê kurd kirin, encam serkeftina îrade û çanda bi hezarê salan a gelê kurd bû. Ji ber ku dara ku li ser koka xwe şîn bibe, tu hebûn nikare wê bi temamî ji cih û koka wê bike û winda bike.